# KURDIYA NÛJEN

Ji bo hîndekariya ziman

ÇETO ÖZEL

Institut kurde de Paris

ENSTÎTUYA KURDÎ

STENBOL 1992

WEŞANÊN ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ

Institut kurde de Paris

11/07/2017
815 ÖZE KUR

# Kurdiya Nûjen

## JI BO HÎNDEKARIYA ZIMAN

ÇETO ÖZEL

Institut Kurde de Paris

**LIJNEYA REDAKSIYONÊ**

- HASAN KAYA
- MÜLAZIM ÖZCAN
- ZANA FARQÎNÎ

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

ENSTÎTUYA KURDÎ
STENBOL 1992

WEŞANÊN ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ

**Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê**
13

**Rêza Perwerdeyî**
4

**Çapa Yekemîn**
Adar 2000

**Mîzanpaj**
Z. Abidin Kızılyaprak

**Tîprêzî**
Aysel Çetin

**Wêne**
İmam Cici / Hale İşsever
Murat Kalan / İ. İşler

**Çapxane**
Berdan Matbaacılık

**ISBN**
975-96610-9-8

**Mezopotamya Basın Yayın A.Ş.**
Atatürk Bulvarı, Ceylan Palas Apt., No: 154/12 Aksaray / İstanbul

**Tel**
(0212) 527 19 11

**Fax**
(0212) 527 61 49

# PÊŞEK

Ev pirtûka ku ji bo hînkirina zimanê kurdî ji aliyê Enstîtuya me ve hatiye amadekirin di vî warî de yek ji du sê mînakan e. Heta mirov dikare bi hêsanî bêje ku ev pirtûk ji aliyê rêbaz û teknîka hînkirina zimên de pirtûka yekemîn e.

Ji ber ku pirtûkên ku heta niha ji bo hînkirina kurdî hatine amade kirin bi giştî ji wergeran pêk tên û him jî hejmara wan ji sisê an jî çaran zêdetir nîn e. Ji ber vê sedemê girîngiya vê pirtûkê hîn zêdetir dibe.

Ev pirtûk li gor rêbaz û teknîkên nûjen ji bo mamosteyên zimanê kurdî hatiye amade kirin. Bi alîkariya vê pirtûkê mamoste bi aweyekî raste rast zimanê kurdî fêr dike. Giraniya vê pirtûkê ji hêmanên ragihandin ên wekî guhdarî kirin axaftin, xwendin û nivîsandinê pêk hatiye. Ji bo ku baş sûd jê bê wergirtin divê ku bi awayeke rû bi rû ders bê dayîn û diyalogên tê de bên pêk anîn.

Ev pirtûk ji bo hînkiran xwendin û nivîsandinê nehatiye amade kirin. Bi taybetî ji bo kesên ku xwendin, nivîsandina wan heye lê bi kurdî nizanin hatiye amade kirin. Ev pirtûk di bernameya hînkirina zimanê kurdî de mîna gava yekemîn hatiye amade kirin. Di vê pirtûkê de agahdariyên rêzimanî zêde nîn in. Gotin û hevok betir ji jiyana rojane hatine girtin. Aktîvîteyên vê pirtûkê her çi bingeha xwe ji jiyana gundan a kurdewariyê girtibin jî lê dîsa naveroka wan bi giştî ji jiyana nûjen a bajarvaniyê pêk tê. Di pirtûkê de xeyn ji hevokên pirs û bersivan axaftinên rojane, peyvên girîng ên ji bo bîranînê û diyalogên cûr bi cûr hene.

Pirtûk ji donzdeh ûnîtan û azmûnekê pêk hatiye. Ev ûnîte li gor deman û kişandina lêkeran gav bi gav hev û du temam dikin. Di nava ûnîteyan de li ser çand û jiyana kurdewariyê gelek tekst jî hene. Her wisa li gor me azmûneke ji bo xwendekaran bi cih kiriye.

Em hêvîdar in ku ev pirtûk di warî fêrkirin û hînbûna zimanê kurdî de bibe gaveke xurt û serkeftî.

Dê xizmetên Enstîtuya Kurdî yên di warê fêrkirin û perwerdekirina çand û zimanê bidome. Ji bo kurdan û kurdîperweran jî hînbûn û perwerdebûna kurdî dimîne.

Em wekî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji bo hemû xwendekar û mamosteyên kurdî şadî bextewarî û serfirazî dixwazin.

**ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ**

Institut kurde de Paris

# Pêşgotin

Gava axaftin li ser dîroka fêrkirina zimanê Kurdî tê kirin, medrese û mizgeft tên bîra min. Gelek kesan di medrese û mizgeftan de, di wî warî de xebat kirine. Senga melayên Kurd li wir diyar e. Wan waîzên xwe bi kurdî didan, diayên xwe bi kurdî dikirin û dersên olî bi kurdî didan. Em dişên bibêjin li Kurdistanê mizgeft û medreseyan alîkariya peşveçûna zimanê kurdî gelek kiriye. Bi gelemperî hemû mela û feqeyên kurd xebatên Eliyê Herîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Mela Ehmedê Bateyî, Ehmedê Xanî, Mela Mihemedê Koyî, Cegerxwîn û gelek rumetên din ên Kurdan pê agahdar in. Niha jî rêzikên Nûbara Ehmedê Xanî û rêzikên Mewlûda Mela Ehmedê Bateyî yên ku min ji mizgeft û medreseyan bihîstî li bîra min in. Bêguman, mebesta Melayên kurd ne tenê fêrkirina olî bû. Wan li gel dersên olî, dersên kurdî jî didan û li gelek cihan niha jî didin. Kesekî wekî Cegerxwîn jî li wan medreseyan gihiştibû.

Piştî ku rewşenbîrê berketî Celadet Bedirxan bingeha alfabe û rêzimanê kurdî danî, gelek materyalên zimanfêrkirinê, kovar, rojname û romanên kurdî hatin nivisandin. Xebatên Celadet Bedirxan ên nûjen bandoreke gewre û pozîtîf li ser ziman, çand û wêjeya kurdî kiriye. Ev pirtûk jî ji fêkiyên wan rûmet û xebatan e.

Berî nivîsandina vê pirtûkê yek ji armancên min ew bû ku ez pirtûkên ji bo fêrkirina zimanê Kurdî binivîsim. Belê her wekî gotineke kurdan dibêje "Heta min kar kir, wan bar kir". Li wir "wan" xwendekar bûn. Nivîsandina vê pirtûkê hemû bi saya xwendekaran pêk hat. Di sala 1996'an de komek xwendekarên zanîngehan li Enqereyê hatin nik min û gotin "Em dixwazin zimanê kurdî fêr bibin." Bi rastî, ew daxwaza xwendekarên kurd li metropolê bandoreke pir mezin li ser min kir, ji ber ku ew xwendekar ji bo fêrbûna zimanê xwe gelek têhnî bûn. Diyar bû ku di jiyana wan de valahiyeke gelek gewre hebû û wan dixwast wê valahiyê bi dilekî dilsojî û bi rik tejî bikin, li ser rihên xwe şîn bibin û bejn bidin.

Piştî hindek dan û standina li gel xwendekaran, me biryar da ku em dersên Kurdî dest pê bikin. Belê di encama çend lêkolîn û lêgerînan de em têgihiştin ku ji aliyê teknîkî ve hindek astengên me hene. Ew materyalên ku em gihiştinê hemû bi gelemperî li ser rêzimana kurdî hatibûn nivîsandin. Pirtûkên ku ji bo fêrkirina ziman hatibûn amadekirin jî, têrî pêwistiyên xwendavanên me nebûn ji ber ku li ser bingeha wergera ziman bûn.

Vêca, me biryar da ku em materyalên xwe li gor pêwistiyên xwendekarên xwe amade bikin. Nivisîna vê pirtukê bi wî awayî dest pê kir.

Ev pirtûk a yekemîn e û ji bo kesên ku çu kurdî nizanin an jî yên ku kêm dizanin hatiye amadekirin.

Divê em baş zelal bikin ku ev pirtûk bi rêbazên ragihandinî (komînîkasyonî) û li gor pêwistiyên xwendekaran hatiye nivîsandin. Lewma me dît ku hem xwendekarên Kurd û hem jî hindek ên Tirk bi hejmarek bilind beşdarî dersan bûn.

Di wê nabeynê de me sê salan rêka ceribandina vê pirtûkê dît û di bikaranînê de me zêdeyî û kêmasiyên wê di ber çavan re derbas kirin.

Heke ew bi rêbazên nûjen bê bikaranîn, xwendavan gelek bi zîrekî û dilxweşî beşdarî çalakiyan dibin. Hemû çalakiyên di pirtûkê de li ser bingeha ragihandinê pêk hatine. Bi gotineke din, giraniya çalakiyan li ser guhdarîkirin, axaftin, xwendin û nivîsandinê ne. Divê ders di nav rewşeke zindî, her wekî li nav jiyaneke rastî bên bikaranîn. Ziman ji bo ragihandinê ye. Bêyî ragihandinên zindî jî fêrbûna ziman rê nadin.

Ji bo serhatina vê pirtûkê keda gelek kesan heye. Ez li vir ji hemûyan re spas dikim. Bi taybetî ez spasî ji hemû xwendavanên xwe dikim.

Xebatkarên Ensîtuya Kurdî ya Stenbolê pirtûk bi serî heta binî nivîsiye, nexşandiye û weşandiye. Spasiyek herî gewre jî ji bo wan xebatkaran dikim.

Mebesta min ew e ku dû vê pirtûka destpêka kurdî, ez rêzek pirtûkan ji bo kurdiya navîn, bilind û akademîk amade bikim.

Hêvîdar im ku ev pirtûk ji bo perwerdekirina zimanê kurdî dê bibe çîruskek ji bo agireke geştir, ronahîtir û mezintir.

**Çeto ÖZEL**

Institut kurde de Paris

# JI MAMOSTEYAN RE

Mamosteyên hêja,

Ziman pîroz e. Bêziman jiyan nabe. Di dîroka mirovatiyê de girîngiya rola ziman bêguman nayê nîqaşkirin. Her tiştê mirovatiyê ku îro heye wekî teknolojî, çand, wêje, dîrok û hwd. bi saya ziman pêk hatiye. Ziman dewlemendiyeke mirovatiyê ya herî gewretirîn e. Cudatiyeke di navbenda heywan û mirovan de ew e ku, mirov xwedî ziman in, dikarin biaxivin û ramanên xwe bi riya zimanî ji êk û din re bigihînin. Wateya wê ew e ku ziman ji bo ragihandinan tê bikaranîn. Gelş jî ew e ku em dê çawa bi awayekî rayda zimanî ji bo ragihandinan fêr bikin.

Ez dixwazim hindek ramanên xwe yên der barê zimanfêrkirin û bikaranîna vê pirtûkê de li gel we par bikim.

Her wekî tê zanîn, fêrkirina zimên li gel fêrkirina mijarên din wekî matematîk, fîzîk û hwd ne wek hev e. Cudatî û taybetiyên wê hene. Ew zindî ye û herdem di jiyana me de ye; xizmeta ragihandinê di navbera me de dike.

Ji bo fêrkirina wî heta niha gelek rêbaz hatine ceribandin. Ji wan rêbazan ên sereke ev in:

1- Rêbaza wergirandina rêzimanî
2- Rêbaza rasterê
3- Rêbaza xwendinê
4- Rêbaza audîo- lîngual (vîjual/dîdenî)
5- Rêbaza ragihandinê (komînîkasyonê)

Şîrovekirina her rêbazekê mijarek serbixwe ye, ji ber wê hindê ez li ser şîrovekirina wan ranawestim. Belê divê em di fêrkirina ziman de riyeke eklektîk bigirin. Bi gotineke din, divê hemû rêbaz û teknîkên ku bi kêrî me tên em bi kar bînin.

Di vê pirtûkê de jî bi giranî rêbaza ragihandinê hatiye bikaranîn, belê rexên kêrhatî yên rêbazên din jî cihê xwe digirin.

Her çar qabîliyetên zimên, guhdarîkirin, axaftin, xwendin û nivîsandin, di vê pirtûkê de bi wekhevî tên fêrkirin. Ji bo ku em bikarin bibêjin em ziman fêr dikin, divê em giraniya dersên xwe bidin li ser her çar qabîliyetan. Belê çawa? Bi çi awayî?

Divê em bi zanistî dersên xwe li dar bixin. Xalên jêrîn ji bo fêrkirina zimên bingehîn in.

1- Pêşkêşkirina zimên
2- Bikaranîna zimên di bin kontrola mamoste de
3- Bikaranîna zimên bêkontrola mamoste
4- Bikaranîna zimên ji bo ragihandinan.

Piştî ku mamoste biryar da ku ew dê çi ders bide û piştî ku amadekariya xwe kir, sefheya yekemîn PÊŞKÊŞKIRINA wê dersê ye. Di wê sefheyê de kontrol sedased di bin destê mamoste de ye. Mamoste jî bi devkî, çi bi wêneyan an jî bi seneryoyekê zimanê ku ew dixwaze, pêşkêş dike. Paşê pêşkêşkirina mamoste forma zimanê li ser textê dinivîse. Êre xwendekar tenê guhdarî dikin, ew naaxivin.

Sefheya duyemîn BIKARANÎNA ZIMANÎ ye. Di vê sefheyê de mamoste riya xwendekaran ji bo bikaranîna zimanî vedike, belê kontrola xwe ji dest bernade. Xwendekar di bin bandora mamoste de zimanê ku ji bo wan hatiye pêşkêşkirin, bi kar tînin. Divê mamoste di vê sefheyê de sinifê baş bi rê ve bibe û materyalên ku ji bo pratîka zimên hatine amadekirin, baş binase û bi kar bîne.

Sefheya sêyemîn BIKARANÎNA ZIMANÎ BÊKONTROLA MAMOSTE ye.

Di vê sefheyê de mamoste kontrola xwe li ser sinifê sist dike. Êre xwendekar bi serê xwe ne. Ew zimanê ku wan di sefheya yekemîn û duyemîn de dîtibû ew dê bi kar bînin. Bêguman xwendekar dê di wê sefheyê de xeletiyan bikin belê ew dê xwe bixwe xeletiyên hev û din rast bikin. Mamoste wê gavê her wekî alîkarekî/ê di sinifê de rola xwe tîne cih. Axiftina mamoste kêm e ya xwendekaran pir e. Serfirazbûna xwendekaran di wê sefheyê de, girêdayî sefheya yekemîn û duyemîn e. Heke sefheya yekemîn û duyemîn bi rêk û pêk cihê xwe girtibe, fêrbûna zimanî dê di sefheya sêyemîn de hêsantir be.

BIKARANÎNA ZIMANÎ JI BO RAGIHANDINAN sefheya çaremîn e. Di wê sefheyê de divê em rê bidin xwendekaran da ku zimanê ku fêrbûne ji bo ragihandinên xwe bi kar bînin. Armanca fêrbûna zimanî ji bo ragihandinan e. Heke xwendekaran têrî xwe di sinifê de ziman ji bo armancên xwe bi kar anîn, ew dê bikarin li derveyî sinifê di nav civakê de jî wî zimanî ji bo ragihandinên xwe bi kar bînin. Ji bo ragihandinên di sinifê de, mamoste dikare xwendekaran didu didu an jî kom kom bide xebitandin.

Dibe ku rê nebe ku her çar sefheyên zimanfêrbûnê di dersekê de cihê xwe bigire. Hingî xem nîn e. Em dikarin di dersên din de an jî roja paştir wan bi kar bînin. Ew hemû girêdayî bernameya mamoste ye.

Em dikarin prosesa zimanfêrkirinê bi kurtî bînin ber çavên xwe.

| | |
|---|---|
| 1- Kontrola mamoste % 100 e | Pêşkêşkirina ziman |
| 2- Kontrola mamoste % 90 e | Bikaranîna ziman |
| 3- Mamoste alîkar e | Bikaranîna ziman |
| 4- Xwendevan ziman ji bo armancekê bi kar tînîn. Mamoste alîkar e | Bikaranîna ziman ji bo ragihandinan |

Hûn dê her çar sefheyên zimanfêrbûnê di nav vê pirtûkê de peyda bikin. Di serê her unîte û beşên unîteyên (A. B. C. D.) de divê mamoste zimanî bi rêyeka ragihandinî (komînîkasyonî) bi awayekî devkî, bi wêneyan an jî bi seneryoyekê pêşkêş bike. Piştî ku zimanê di unîtê de an jî di beşên ûnîteyê de hatin pêşkêşkirin karê mamoste hêsantir dike ji ber ku sefheyên din di nav pirtûkê de xwe bixwe şîrove dikin. Ew jî herwekî rêberekê alîkariya mamoste û xwendekaran dike.

Di dawiya her unîteyê de kurte rêzimana wê unîteyê hatiye şîrovekirin. Ji bilî rêzimanî bêjeyên girîng ji bo bîranînê jî hatine nivîsîn. Dîsa dawiya her unîteyê ji bo xwendavanan hîndarî hene.

Xwendekar wan hîndariyan ji derveyî sinifê çêdike. Bi wî awayî fêrbûna ziman û perwerde li derveyî sinifê jî berdewan dike.

Serfirazbûn û serketina we hêvî û daxwaziya me ya herî pêşîn e.

**Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê**

Institut kurde de Paris

# UNÎTE 1

## 1 A - ROJBAŞ! NAVÊ TE ÇI YE?

A - Rojbaş. Navê min Şîlan e. Navê te çi ye?

B - Navê min Dilxwaz e.

A - Tu ji ku derê yî Dilxwaz?

B - Ez ji Hekariyê me.



Institut kurde de Paris

G. 1 **_HÎNDEKARÎ_**

*2 - Guhê xwe bide diyaloga jêrîn û cihê vala tijî bike.*

A - Rojbaş! .......... min Azad ..........

Navê ......... çi .........?

B - Serdar..........

A - Tu ...... ku derê ........ Serdar?

B - Ez ji Wanê ........ Tu ji ....... .........?

A - Ez ji Batmanê ........

*3- Navê xwe bibêje.*

"Roj baş, navê min................."

*4- Navê xwendekarên din bipirse.*

"Navê te çi ye?"

## 1 B - NAVÊ WÎ RIZGAR E.

### *1 - WÎ - WÊ*

Navên mirovên jêrîn çi ne?

| | | |
|---|---|---|
| Xezal | Elî | Egît |
| Beybûn | Binevş | Rizgîn |



Navê wê.............



Navê wî.............



Navê wî.............



Navê wê.............



Navê wê.............



Navê wî.............

Institut kurde de Paris

***2- Hevokên jêrîn tijî bikin.***
***Mînak:*** Navê wê Xezal e.

1 - Navê ............. Kemal ............

2 - ......... ............. Zelal ............

3 - ........ ............. Zerê ............

4 - ........ ............. Azad ............

5 - ........ ............. Ronak ............

***3- Niha pirsa navên xwendekarên di sinifê de bikin.***

"Navê te çi ye?"

"Navê wê .................. ........................

"Navê wî çi ye?"

"Navê wî .................. ........................

***4 - Alfabeya Kurdî***

**A Tîpên Girdek:**
A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z

**B Tîpên Hûrdek:**
a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

G. 2

***5- Guhdarî bikin û tîpan binivîsin.***

***Mînak:***

t z a f h

***6- Pirsa tîpên navê hevalê xwe bike.***

***Mînak:*** Tîpên navê te çi ne?

Tîpên navê min: B, e, r, î, v, a, n.

Institut kurde de Paris

# 1 C - TU ÇAWANÎ?



G. 3 ***1- Guhdarî bike û diyaloga jêrîn bixebite.***

**Belqîs:** Tu çawa yî Serdar?

**Serdar:** Ez baş im. Zor spas. Tu çawa yî?

**Belqîs:** Ez jî baş im. Zor spas.

***2- Pirtûka xwe bigire û diyaloga jorîn bixebite.***

G. 4 ***3- Guhê xwe bide diyaloga jêrîn û cihê vala tijî bike.***

**Beybûn:** Rizgîn, ........ dixwazim
hevalê xwe Egît bi te bideme nasîn.

**Rizgîn:** ......... .......... Egît.

**Egît:** Roj baş Rizgîn.

**Beybûn:** Egît.......... Amedê ...........

**Rizgîn:** Birastî! Ez .......... ji Amedê me.

**Beybûn:** Min nizanîbû ku hûn her du ......... ......... Amedê ne.

***4 - Niha didu ji we bixebitin û diyalogeke wekî ya jorîn binivîsin û dubare bikin.***

Institut kurde de Paris

# 1 D - TU JÎ KU DERÊ YÎ

### 1- Ew ji ku derê ye? Guhdarî bike û dûv re bibêje.

G. 5

| WELAT | NETEWE | ZIMAN |
|---|---|---|
| Kurdistan | kurd | kurdî |
| Tirkiye | tirk | tirkî |
| Elmanye | elman | elmanî |
| Emerîka | emrîkayî | îngilîzî |
| Japonya | japon | japonî |
| Îtalya | îtalî | îtalî |
| Îngilîzîstan | îngilîz | îngilîzî |
| Îran | fars | farisî |
| Kuba | kubayî | spanyolî |
| Hindistan | nindû | hindî |

Institut kurde de Paris

### 2 -Tu ji ku derê yî?

Ez ji Tirkiyê me. Ez tirk im.
Navê min Erol e.

Ez ji Îranê me. Ez îranî me.
Navê min Şahpur e.

Ez ji Frenseyê me.
Ez frensî me.
Navê min Erîc e.

*Pirsa Hevalê xwe bike "tu ji ku derê yî?"*

### 3- Ew ji ku derê ye?

Ew ji Hindistanê ye. Ew hindî ye.
Navê wî Gandî ye.

Ew ji Emerîkayê ye. Ew emrîkî ye.
Navê wî Bill e.

Ew ji Îngilîzîstanê ye. Ew îngilîz e.
Navê wê John e.

Ew ji Pakîstanê ye. Ew pakistanî ye.
Navê wê Benazîr e.

### 4- Rojda ji ku derê ye?

Rojda ji Kurdistanê ye. Ew kurd e.
Bextiyar ji Îranê ye. Ew faris e.
Helmut ji Elmanyayê ye. Ew elman e.

## GRAMERA UNÎTE 1

| | |
|---|---|
| Ez baş im. | Ez tî me. |
| Tu baş î. | Tu tî yî. |
| Ew baş e. | Ew tî ye. |
| Em baş in. | Em tî ne. |
| Hûn baş in. | Hûn tî ne. |
| Ew baş in. | Ew tî ne. |

***RÊZ:*** *Heke tîpa dawî dengdar* **be im, î, e in** *têtê nivîsandin; belê heke dengdêr be hingî* **me, yî, ye, ne** *tê nivîsandin.*

## HÎNDEKARÎ

### *1 - Cihê vala bi qertafên jêrîn tijî bikin.*

im, î, e, in, me, yî, ye, ne

| | |
|---|---|
| Ez gelek nexweş ....... | Ez westî ......... |
| Tu gelek nexweş ....... | Tu westî ......... |
| Ew gelek nexweş ....... | Ew westî ........ |
| Hûn gelek nexweş ....... | Em westî ........ |
| Em gelek nexweş ....... | Hûn westî ....... |
| Ew gelek nexweş ....... | Ew westî ......... |

### *2 - Di zimanê Kurdî de, du cure cînavkên kesîn hene.*

| 1 | 2 | |
|---|---|---|
| Ez | min | Navê min Hişyar e. |
| Tu | te | Navê te Bengîn e. |
| Ew | wê (mê) | Navê wê Belqîsa ye. |
| Ew | wî (nêr) | Navê wî Rêber e. |
| Em | me | Navê me Belqîsa û Bahoz e. |
| Hûn | we | Navê we Serdar û Şîrvan e. |
| Ew | wan | Navê wan Binevş û Gulê ye. |

### *3 - JI*

| | |
|---|---|
| Erol ji Tirkiyê ye. | Mîterand ji Frenseyê ye. |
| Klînton ji Emerîkayê ye. | Tu ji Kurdîstanê yî. |

# UNÎTE 2

## 2 A - TU ÇI KARÎ DIKÎ?

***1- Cihên vala tijî bikin.***

Karker

Mamoste

Nivîskar

Bijîşk

Dadmend

Parêzer

Bêkar



Ew karker e



Ew ......................



Ew ......................



Ew ......................



Ew ......................



Ew ......................



Ew ......................

Institut kurde de Paris

### *2 - Tu çi karî dikî? Bersivê bide.*

***Mînak:***" Ez mamoste me".

" Ez karker im".

" Ez bijîşk im"

" Ez parêzer im."

### *3 - Pirs bike û bersivê bide.*

" Tu çi karî dikî?"

" Ez ............."

### *4 - Xwendekarên di sinifê de çi karî dikin? Ji wan bipirse.*

***Mînak:*** " Ehmed karker e."

" Beybûn bijîşk e."

" Elîf mamoste ye."

" Baran xwendekar e."

G. 6

### *5 - Guhdarî bikin û bixebitin.*



- Tu çi karî dikî?
- Ez xwendekar im.



- Tu dadmend î?
- Belê ez dadmend im.



- Tu mamoste yî?
- Na, ez ne mamoste me, ez karker im.

### *6 - Pirsan ji xwendekaran bike.*

"Tu bijîşk î?"
"Belê ez bijîşk im."
"Na, ez ne endezyar im, ez karker im."
"Na, ew ne parêzer e. Ew karker e."

### *7 - Di heqê xwendekaran de biavifin.*

"Ma, Elî mamoste ye?"
"Belê, ew mamoste ye."
"Ma, Belqîsa parêzer e?"

Institut kurde de Paris

## 2 B - Zor Spas. Ez baş im.

### *1 - Beyanî, êvar û şev.*



Beyanî



Êvar



Şev

G. 7

### *2 - Guhdarî diyalogan jêrîn bike.*



**Baran:** Beyanî baş Xemgîn. Tu çawa yî?
**Xemgîn:** Beyanî baş Baran. Ez zor baş im. Zor spas. Tu çawa yî?
**Baran:** Ez jî baş im. Zor spas.

G. 8

### *3 - Guhdarî bike û cihê vala tijî bike.*



**Zelal:** .............. baş Bahoz.
**Bahoz**: Êvar baş Zelal. Tu çawa yî?
**Zelal:** Ez .............. zor spas. Tu çawa yî?
**Bahoz:** Ez jî baş im. Belê keça min nexweş e.
**Zelal:** Waa! Divê te ew bibira ...................

### *4 - Li ser her du diyalogan bixebitin.*

### *5 - Rabin ser piya û pirsan ji xwendekaran bikin.*

"Beyanî baş."
"Roj baş."
"Êvar baş."

"Şev baş."

"Tu çawa yî?"
"Ez baş im, zor spas."
"Ê, tu çawa yî?"

Institut kurde de Paris

# 2 C - Tu çend salî yî?

G. 9

## *1 - Guhdarî bikin û bixebitin.*

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 1 Yek | 11 Yanzdeh | 21 Bîst û yek | 40 Çil | 42 Çil û du |
| 2 Du | 12 Donzdeh | 22 Bîst û du | 50 Pêncî | 53 Pêncî û sê |
| 3 Sê | 13 Sêzdeh | 23 Bîst û sê | 60 Şêst | 64 Şêst û çar |
| 4 Çar | 14 Çardeh | 24 Bîst û çar | 70 Heftê | 44 Çil û çar |
| 5 Pênc | 15 Panzdeh | 25 Bîst û pênc | 80 Heştê | 88 Heştê û heşt |
| 6 Şeş | 16 Şanzdeh | 26 Bîst û şeş | 90 Nod | 99 Nod û neh |
| 7 Heft | 17 Heftdeh, hevdeh | 27 Bîst û heft | 100 Sed | 101 Sed û yek |
| 8 Heşt | 18 Heştdeh, hejdeh | 28 Bîst û heşt | | |
| 9 Neh | 19 Nozdeh | 29 Bîst û neh | | |
| 10 Deh | 20 Bîst | 30 Sih, sî | | |

G. 10

## *2 - Guhdarî bike û hejmarên ku tu dibihizî binivîse.*

***Mînak:*** "Şanzdeh" - 16
"Bîst û çar" - 24

## *3 - Bihejmêre*

- Yek yek bihejmêre...1, 2, 3,......
- Didu didu bihejmêre...2, 4, 6,.........
- Sê sê bihejmêre...3, 6, 9, .......

## *4 - Tu çend salî yî?*

***Mînak:*** "Ez bîst û pênc salî me."
"Ez sih û şeş salî me."

Niha ji hevala xwe bipirse, "Tu çend salî yî?"







Institut kurde de Paris

## *5 - Ew mirovên jêrîn çend salî ne?*



Dilxwaz



Dilvan



Sorgul



Birûsk

Ez bibêjim Dilxwaz ............. salî ye.
Ez bibêjim Dilvan ............. salî ye.
Ez bibêjim Sorgul ............. salî ye.
Ez bibêjim Birûsk ............. salî ye.

Institut kurde de Paris

## 2 D - XWENDIN

G. 11 

### *1 - Di heqê Avşînê de guhdarî bike û bixwîne.*

Roj baş. Navê min Avşîn e. Ez bêrîvan im. Ez donzdeh salî me. Ez ji Wanê me. Min du bira û xwîşkek hene. Navên birayên min Piling û Rimdar e. Piling bîst salî ye. Rimdar bîst û heşt salî ye. Navê xwîşka min Şevbîn e. Ew nozdeh salî ye. Piling mamoste ye. Rimdar karker e.



### *2 - Bersiva pirsên jêrîn bide û binivîse.*

1 - Navê wê çi ye?

..................................................

2 - Ew çi karî dike?

..................................................

3 - Ew çend salî ye?

..................................................

4 - Ew ji ku derê ye?

..................................................

5 - Wê çend xwîşk û bira hene?

..................................................

6 - Navên birayên wê çi ne?

..................................................

7 - Navê xwîşka wê çi ye?

..................................................

8 - Piling çend salî ye?

..................................................

9 - Rimdar çend salî ye?

..................................................

10 - Xwuşka Avşînê çend salî ye?

..................................................

11 - Piling çi karî dike?

..................................................

12 - Rimdar çi karî dike?

..................................................

13 - Şevbîn çi karî dike?

..................................................

Institut kurde de Paris

### *3 - Di heqê Sîdarî de bixwîne û cihên vala tijî bike.*

Navê min Sîdar e. .......... mamoste ..........
Ez sih .......... pênc .......... me. Ez ..........
Şemzînan im. Şemzînan bajarekî biçûk e,
belê gelek ciwan e. Min du zarok .......... ,
yek keç û yek kur ..........  .......... keça
min Berçem e û ew deh .......... ye. Navê
kurê .......... Zerdeşt e û ew panzdeh
salî ..........

### *4 Bersiva pirsên jêrîn bide û binivîse.*

1 - Navê wî çi ye?

..........................................................

2 - Ew çi karî dike?

..........................................................

3- Ew çend salî ye?

..........................................................

4 - Ew ji ku derê ye?

..........................................................

5 - Wî çend zarok hene?

..........................................................

6 - Navê keça wî çi ye?

..........................................................

7 - Navê kurê wî çi ye?

..........................................................

8 - Kî deh salî ye?

..........................................................

9 - Kî panzdeh salî ye?

..........................................................

Institut kurde de Paris

### *5- Pirsên jêrîn ji xwendekarekê bike û bersîvên wê binivîse.*

1- Navê te çi ye?

........................................

2- Bernavê te çi ye?

........................................

3- Tu çend salî yî?

........................................

4- Tu çi karî dikî?

........................................

5- Tu ji ku derê yî?

........................................

6- Navnîşana te çi ye?

........................................

### *6- Niha bersîvên xwe ji bo xwendekaran bixwîne.*

***Mînak:*** Navê wî Zerdeşt e./Navê wê Hemrîn e.
Bernavê wî Zana ye. ........................................................................................

..............................................................................................................

..............................................................................................................

..............................................................................................................

..............................................................................................................

### *7- Niha beşekî di heqê xwe de binivîse.*

Weha dest pê bike:
Navê min ..........................................................................................

..............................................................................................................

..............................................................................................................

..............................................................................................................

..............................................................................................................

..............................................................................................................

..............................................................................................................

Institut kurde de Paris

### *8- Lê binêrin û cihên vala tejî bikin.*

### *Kirin*

Erênî

| | | |
|---|---|---|
| Ez | kar | dikim? |
| Tu | | dikî? |
| Ew<br>Ew | | dike? |
| Em<br>Hûn<br>Ew | | dikin? |

Neyînî

| | | |
|---|---|---|
| Ez | kar | nakim |
| Tu | | nakî |
| Ew<br>Ew | | nake |
| Em<br>Hûn<br>Ew | | nakin |

### *9 - Dema niha bi kar bînin û hevokan bi lêkera KIRINê kuta bikin.*

Ez li televîzyonê temaşe ---------.
Tu ,, ,, ---------.
Ew ,, ,, ---------.
Ew ,, ,, ---------.
Em ,, ,, ---------.
Hûn ,, ,, ---------.
Ew ,, ,, ---------.

### *10 - Hevokên jorê bikin neyînî û binivîsin.*

***Mînak:*** Ez li televîzyonê temaşe nakim.

### *Bêjeyên girîng ji bo bîranînê.*

| | | | |
|---|---|---|---|
| kar | dadmend | beyanî | sal |
| karker | dadgeh | êvar | bira |
| mamosta | parêzer | şev | dibistan |
nivîskar | bijîjk | çend | pênûs |

### *Bi peyvên jorîn pênc hevokan çêkin.*

1- ..................................................................................
2- ..................................................................................
3- ..................................................................................
4- ..................................................................................

Institut kurde de Paris

# UNÎTE 3

## 3 A - EV ÇI YE?

G. 12 ***1 - Guhdarî bike û dûv re bibêje.***

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Pirtûk |  | Sêv |  | Bacana reş |  |
| Ferheng |  | Bacana sor |  | Kilîl |  |
| Pênûs |  | Îsot |  | Qûşxane |  |
| Kamera |  | Porteqal |  | Kursî |  |
| Telefon |  | Xiyar |  | Mêzîn |  |

"Ew bi Kurdî çi ye?"
"Ew pirtûk e."

"Ew bi Kurdî çi ye?"
"Ew pênûs e."

***2 - Pirsan ji mamosteyê/ya xwe bike.***

***Mînak*:**

*Xwendekar:* "Ew bi Kurdî çi ye?"
*Mamoste:* "Ew rojname ye"
*Xwendekar:* "Ew bi Kurdî çi ye?"
*Mamoste:* "Ew gustîl e."

Institut kurde de Paris

## 3 - Ew çi ne?

G. 13 *Guhdarî bike û dûv re bibêje.*

| | |
|---|---|
| "Ew çi ne?" | |
| "Ew pirtûk in." |  |
| "Ew pênûs in." |  |
| "Ew kamera ne." |  |
| "Ew qûşxane ne." |  |

Institut Kurde de Paris

## 4 - Berê xwe bide dora xwe û navê hinek tiştan binivîse.

***Mînak:***

"Ew/ kursî ne."
"Ew mase ye."

## 3 B

### 1 - Pirtûk li ku derê ye?

Ser, nav, rex, bin, nêzîk

"Pirtûk li ku derê ye?"

"Pirtûk li ser maseyê ye."

"Pênûs li ku derê ne?"

"Pênûs li bin maseyê ne."

"Rojname li ku derê ne?"

"Rojname li bin maseyê ne."

"Kursî li ku derê ye?"

"Kursî li rex maseyê ye."



### 2 - Niha tu bibêje û binivîse

- Pirtûka te li ku derê ye?
- Pênûsa te li ku derê ye?
- Kî li rex te ye?

### 3 - Navên jêr bikin piranî.

***Mînak:*** Ew televîzyon e.
Ew televîzyon in.

Ew sêv e.
.......................

Ew dar e.
....................

Ew hesp e.
..................

Ew piling e.
.....................

Ew jinik e.
.......................

Ew mêr e.
.......................

Ew zarok e.
................

Ew mirîşk e.
...................

Institut kurde de Paris

## 3 C - TE ÇEND XWÎŞK Û BIRA HENE?

14 **1 - Guhdarî bike û bixebite.**

| | |
|---|---|
| *Rizgîn:* | Te çend xwîşk û bira hene Baran? |
| *Baran:* | Min xwîşkek û du bira hene. |
| *Rizgîn:* | Navê wan çi ne? |
| *Baran:* | Navê xwîşka min Nêrgîz e û navên birayên min Rêzan û Bedran in. |

**2 - Niha tu bibêje, te çend xwîşk û bira hene.**

**3 - Ji hevalê xwe bipirse, "Te çend xwîşk û bira hene?"**

**4 - Li wê malê çi tişt hene?**



| | | |
|---|---|---|
| Televîzyon | pirtûk | kaset |
| teyb | rojname | telefon |
| mase | mafûr | kursîk |
| sêpê | | |

**Mînak:** Li wê malê televîzyonek heye.
Li wê malê du kursî hene.

.................................................. ..................................................

.................................................. ..................................................

.................................................. ..................................................

.................................................. ..................................................

.................................................. ..................................................

Institut kurde de Paris

## 4 - Niha bibêjin li wê sinifê çi tişt hene?

***Mînak:*** Li wê sinifê mamosteyek heye.
Li wê sinifê deh xwendevan hene.

................................................................................

................................................................................ ................................................................................

................................................................................ ................................................................................

................................................................................ ................................................................................

................................................................................ ................................................................................

## 5 - Niha binivîsin û bibêjin li mala we çi tişt hene.

***Mînak:*** Li mala min televizyonek heye.
Li mala min şeş kursî hene.

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

G. 15

## 6 - Niha guhê xwe bidin û dûra bi bêjin.

çarsû, rûbar, şano, çîya, daristan, restoran, dikan, gol, derya

### Binivîse li bajarê te çi heye.

***Mînak:*** Li bajarê min da sînemek heye.

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

Institut kurde de Paris

## 3 D

G. 16 ## 1 - Guhdarî bike û cihê vala tijî bike

Navê pêşî :.........................
Navê paşî :.........................
Kar :.........................
Navnîşan :......................... ......................... .........................Amed
Çend salî :.........................
Navê mêrî :.........................
Karê mêrî :.........................
Çend zarok :.........................
Navên zarokan :.........................
Çend salî ne :Rizgîn 5, Nûpel .........................

Institut kurde de Paris

G. 17 ## 2 - Guhdarî bike û bersîva herî çêtir bide

a) Navê bajarê te çî ye?

A: Beyanî baş!
B: Amed e.
C: şuxê

b) Tu çend salî yî?

A: Zor spas ez baş im.
B: Sih û şeş
C: Ser maseyê

c) Beyanî baş.

A: Beyanî baş
B: Êvar baş
C: Şev baş

d) Navê xwîşka te çî ye?

A: Belqîs e.
B: Elî ye
C: Rizgîn e

e) Tu çi kar dikî?

A: Ez mamoste me
B: Ez baş im.
C: Min çar bira hene

f) Tu çawa yî?

A: Pênc pirtûk û pênûsek
B: Ser maseyê
C: Ez baş im. Zor spas.

### *3 - Çar bêjeyan li ser lîsteya jêrîn binivîsin*

Karker, mamosta, __________ __________ __________.
Elman, Îngilîz, __________ __________ __________.
Japonye, Tirkiye, __________ __________ __________.
Dayîk, bab, __________ __________ __________.
Ez, tu, __________ __________ __________.
Beyanîbaş, rojbaş, __________ __________ __________.

### *4 - Hevoksazî*

***Mînak:*** Hene bira çar min
Min çar bira hene

1. li maseyê ser pirtûk hene dû ..........................................

2. salî yî çend tu? ..........................................

3. xwîşk çend bira te û hene? ..........................................

4. çi ye navê te xwîşka? ..........................................

5. te bira yê dike kar çi? ..........................................

6. kurdî bi ew çi ye? ..........................................

7. çawa tu yî? ..........................................

8. im karker ez ..........................................

9. kar sibe nakim ez ..........................................

10. de mala min li xalîçeyek heye ..........................................

11. heye hespek wî ..........................................

Institut kurde de Paris

***Lê binêrin û bersîva pirsên jorîn bidin.***

## ***Bûn***

Yekejmar (erênî)

| | | |
|---|---|---|
| Ev | sêv<br>pirtûk<br>kursî<br>pênûs | e. |

Yekejmar (neyînî)

| | | |
|---|---|---|
| Ev | ne | sêv e<br>pirtûk e<br>jêbir e<br>pênûs e |

Pirejmar (erênî)

| | | |
|---|---|---|
| Ev | sêv<br>pirtûk<br>jêbir<br>pênûs | in. |

Pirejmar (neyînî)

| | | |
|---|---|---|
| Ev | ne | sêv in<br>pirtûk in<br>jêbir in<br>pênûs in |

Institut kurde de Paris

## ***Xwedîbûn***

Yekejmar (erênî)

| | | |
|---|---|---|
| Hespekî<br>Gayekî<br>Pirtûkeke<br>Pênûseke<br>Kursiyeke<br>Çêlekeke<br>Beranekî | min<br>te<br>wî<br>wê<br>me<br>we<br>wan | heye. |

Yekejmar (neyînî)

| | | |
|---|---|---|
| Hespekî<br>Gayekî<br>Pirtûkeke<br>Pênûseke<br>Kursiyeke<br>Çêlekeke<br>Beranekî | min<br>te<br>wî<br>wê<br>me<br>we<br>wan | nîn e.<br>tune ye. |

Pirejmar (erênî)

| | | |
|---|---|---|
| Du hespên<br>Du gayên<br>Du pirtûkên<br>Du pênûsên<br>Du kursiyên<br>Çar çêlekên<br>Pênc beranên | min<br>te<br>wî<br>wê<br>me<br>we<br>wan | hene. |

Pirejmar (neyînî)

| | | |
|---|---|---|
| Du hespên<br>Du gayên<br>Du pirtûkên<br>Du pênûsên<br>Du kursiyên<br>Çar çêlekên<br>Pênc beranên | min<br>te<br>wî<br>wê<br>me<br>we<br>wan | nîn in.<br>tune ne. |

***Dema niha bi kar bînin û hevokênj jêrîn kuta bikin.***

1- Ew mafîr .....................
2- Ew ferheng .....................
3- Bahoz mêr e, jin .....................
4- Ew sêv in, hirmî .....................
5- Zerdeştî xwîşkek .....................
6- Me du mafîr .....................
7- Wî çi dirav .....................
8- Wan hindek mêvan .....................

## DAÇEK

### SER, BIN, NAV, REX Û NEZÎK

1- Pirtûk li ser mêzê ye.



2- Kitik (pisîk) li bin mêzê ye.



3- Pênûs li nav pirtûkê daye.



4- Kursîk li rex mêzê ye.



5- Kursîk nêzîk mêzê ye.



Institut kurde de Paris

***Bêjeyên girîng ji bo bîranînê.***

| | | | |
|---|---|---|---|
| pirtûk | ferheng | penûs | mêze |
| kursîk | mafir | ser | nav |
| rex | nêzîk | bin | sêv |
| dar | hesp | jin | mêr |
| zarok | mirîşk | hebûn | kitik |

***Bi bêjeyên jorîn pênç hevokan çê bikin.***

# UNÎTE 4

## 4 A - DANASÎN

### *1 - Ew kî ye?*






G. 18 *Guhdarî bike û dûv re bibêje.*

| **Mêr** | **jin** | **xwîşk** |
| --- | --- | --- |
| Bira | keç | dayîk |
| Bav | zarok | kur |

Institut kurde de Paris

G. 19 [cassette]

## 2 - Bixwîne, guhdarî bike û binivîse

***Mînak:*** Zelal jina Şervanî ye.

a - Şervan ............ Zelalê ye.

b - Zelal ............ Rona û Şîrvan û Kurdo ye.

c - Şervan ............ Rona û Şîrvan û Kurdo ye.

e - Şîrvan ............ Zelal û ............ ye.

f - Şîrvan û Kurdo ............ Zelal û Şervanî ne

g - Şîrvan û Kurdo ............ Zelalê ............

h - Rona, Şîrvan û Kurdo ............ Şervanî û Zelalê ne.

î - Zelal û Şervan dayik û ............ Rona, Şîrvan û Kurdo ne.

j - Şîrvan û Kurdo ............ Ronayê ne.

Institut kurde de Paris

## 3 - Bersîva pirsên jêrîn bidin.

***Mînak:*** Zelal kî ye?
Zelal jina Şervanî ye.

a - Şervan kî ye?
...........................................................

b - Rona kî ye?
...........................................................

c - Şervan û Zelal kî ne?
...........................................................

d - Şîrvan kî ye?
...........................................................

e - Rona, Şîrvan û Kurdo kî ne?
...........................................................

## 4- Niha pirsên jorîn ji hevalên xwe bikin.

## 4 B

### 1 - Didu didu bixebitin û di heqê malbata jêrîn de biaxivin.

*Mînak:* Ew kî ye?

Ew Rênas e.

Rênas kî ye?

Rênas mêrê Sorgulê ye.

Sorgul(50)-Rênas(56)

Avşîn (5) | Besna (8) | Hişyar (15)



Institut Kurde de Paris

### 2 - Bersîva pirsên jêrîn bidin,

a - Navê jina Rênasî çi ye?

..............................................

b - Navê mêrê Sorgulê çi ye?

..............................................

c - Navê xwîşka Hişyar û Besnayê çi ye?

..............................................

d - Navên birayên Avşînê çi ne?

..............................................

e - Hişyar çend salî ye?

..............................................

f - Hişyar û Besnayê çend salî ne?

..............................................

g - Rênas û Sorgul çend salî ne?

..............................................

## 3 - Rêzikên jêrîn bixwîne. Hinek rast in û hinek jî xelet in. Heke xelet be xaçekê (+) dane rex, heke rast be xêçekê (-) dane rex.

***Mînak:*** Sorgul xîşka Hişyari ye. +
Hişyar birayê Avşîn û Besnayê ye. –

a - Rênas mêrê Sorgulê ye
b - Avşîn keça Rênas û Sorgulê ye.
c - Hişyar birayê Avşînê ne.
d - Avşîn birayê Hişyar û Besnayê ye.
e - Avşîn kurê Rênas û Sorgulê ye.
f - Besna kurê Rênas û Sorgulê ye.
g - Avşîn û Hişyar û Besna zarokên Sorgul û Rênasi ne.

Institut kurde de Paris

## 4 - Di heqê wan de biaxivin.

Ew kî ne?

***Mînak:*** Şervan birayê Ronak û Şîrînê ye.
Şervan kurê Hevjîn û Xemgînê ye.




a - Hevjîn ..............................................

b - Xemgîn ..............................................

c - Şervan ..............................................

d - Hevjîn û Xemgîn ...............................

e - Şîrîn û Ronak .......................................

f - Şîrîn, Ronak û Şervan ........................

# 4 C

20 ***1 - Niha guhdarî her du zarokên jêrîn, Xezal û Dilbirîn bikin û bersîvan binivîsin.***

Mirovek ji zarokan dipirse. Guhdarî bikin û bersîvan binivîsin.

P: Navê te çi ye?

B: Navê min Xezal e.

P: Xezal te çend xwîşk û bira hene?

B: Min xwîşkek û birayek hene.

P: Navê xuşka te çi ye?

B: Navê xuşka min Berçem e.

P: Navê birayê te çi ye?

B: Navê birayê min Çekdar e.

P: Navê bavê te çi ye?

B: Serbest e.

P: Navê dayika te çi ye?

B: Şeman e.

P: Xezal tu çend salî yî?

B: Ez pênc salî me.

Institut kurde de Paris

***Bersîva pirsên jêrîn bidin.***

a - Wê çend xuşk û bira hene.

..........................................

b - Navê wê çi ye?

..........................................

e - Ew çend salî ye?

..........................................

c - Navê dayika wê çi ye?

..........................................

d - Navê birayê wê çi ye?

..........................................

***2 - Niha guhdarî Dilbirîn bikin û bersivên wî binivîsin.***

P: Dilbirîn tu çend salî yî?
B: (8)
P: Te çend xuşk û bira hene?
B: (Min du xuşk û du bira hene)
P: Navên xuşkên te çi ne?
B: (Navên xuşkên min Belkîs û Mehsîne ne)
P: Navên birayên te çi ne?
B: (Çekdar û Rizgar)
P: Ew çend salî ne?
B: (Çekdar şeş salî ye, Rizgar heşt salî ye.)
P: Navên dayik û bavê te çi ne?
B: (Navê dayika min Sînem e, navê bavê min Enwer e)

***3 - Niha didu didu bixebitin û pirsên jorîn ji hevalê xwe bikin.***

A: Dilbirîn çend salî ye?

..............................................

B: Wî çend xwîşk û bira hene?

..............................................

C: Navên xwîşkên wî çi ne?

..............................................

D: Navên birayên wî çi ne?

..............................................

E: Navên dayik û bavê wî çi ne?

..............................................

***4 - Niha paragrafekê di heqê Xezalê û beşekê jî di heqê Dilbirîn de binivîse.***

Wisa dest pê bike.

Xezal

Navê wê Xezal e. Wê xwîşkek û birayek hene...................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

Dilbirîn

Navê wî Dilbirîn e. Wê du xwîşk û du bira hene.................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

........................................................................................................................

Institut kurde de Paris

## 4 D - XWENDIN

Ez mirovekî gundî me. Navê min Naman e. Ez heftê salî me. Navê jina min Gulê ye. Min çar zarok hene. Navê gundê min Sererû ye. Sererû gundekî biçûk e û tenê panzdeh mal lê hene. Min çi otomobîl nîn e, belê min hespek heye. Min çi traktor jî nîn e, belê min cotek ga heye.



### 1 - Bersîva pirsên jêrîn bidin.

a. Ew mirovekî/e bajarî ye an jî gundî ye?

..................................................................

b. Navê wî çi ye?

..................................................................

c. Ew çend salî ye?

..................................................................

d. Navê jina wî çi ye?

..................................................................

e. Çend zarokên wî hene?

..................................................................

f. Navê gundê wî çi ye?

..................................................................

g. Gundê wî biçûk e an jî mezin e?

..................................................................

h. Çend mal li gundê wî hene?

..................................................................

î. Çi tiştên xwarinê li gundê wî hene?

..................................................................

j. Wî çi heye, çi nîne?

..................................................................

### 2 - Niha beşekê di heqê xwe de binivîse.

Navê min..................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

Institut kurde de Paris

***3 - Piştî ku te paragraf nivîsî wê paragrafê ji bo hevalên xwe bi dengekî bilind bixwîne.***

***4 - Bi tîpên jêrîn penç hevokan çêkin.***

*Mînak:* Beyanî baş.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Sal | Çend | Hene | Ye | Wî |
| Heye | Me | Ne | Çi ye | Min |
| Kî | Nav | Beyanî | Pirtûk | Te |
| Wê | Ew | Tu | | |

1- ..........................................................................................................

2- ..........................................................................................................

3- ..........................................................................................................

4- ..........................................................................................................

5- ..........................................................................................................

***5 - Bêjeyên girîng ji bo bîranînê.***

| | |
|---|---|
| bira | gundî |
| keç | biçûk |
| kur | jin |
| bab | mêr |
| zarok | kî |

Institut kurde de Paris

# UNÎTE 5

## 5 A - EZ GELEK JI FÊKI HEZ DIKIM, BELÊ EZ HEZ JI CIGARE NAKIM. TU HEZ JI FÊKÎ DIKÎ?

***1 - Didu didu bixebitin û navên tiştan li rex fotografên wan binivîsin.***



Sêv Şîr
Kundir Nan

Muz Goşt
Hirmî Çay

Porteqal Qehwe
Xox Av

Qeysî Bestenî
Tirî Zebeş

***2 - Tiştên xwarin û vexwarinê cuda binivîsin.***

Tiştên xwarinê
xox...

Tiştên vexwarinê
şîr

| | |
|---|---|
| Xox | Şîr |
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |

Institut kurde de Paris

G. 21 3 - ***Guhdarî tiştên xwarinê û vexwarinê bikin û bersîvên xwe kontrol bikin.***

***4 - Dîsa guhdarî bike û dûv re bibêje.***

***5 - Hevalê xwe test bike. Tiştekî/ê ji nav fotografê jorîn nîşan bide û pirsa hevalê xwe bike. Ew çi ye?***

Institut kurde de Paris

# 5 B

### 1 - Niha guhdarî mamostayê xwe bikin û hevokekê ji yên jêrîn bibêjin.

Ez gelek hez ji hirmiyan dikim.

Ez hez ji goştî nakim.

Ez hez ji sêvan dikim.

Ez hez ji huliyan dikim.

Ez hez ji cigarê nakim.

Ez hez ji nanî nakim.

Ez hez ji kovarkan dikim.

### 2 - Niha tu lîsteya xwe çêke.

Tiştên ku tu jê hez dikî û tiştên tu hez jê nakî. Dûv re lîsteya xwe ji bo hevalê xwe bibêje.

..................................................

..................................................

..................................................

### 3 - Bersiva mamostayê xwe bide.

*Mamoste:* Serdar tu hez ji çi dikî?

*Serdar:* Ez hez ji besteniyê dikim.

G. 22

### 4 - Niha guhdarî bike. Ew mirovên jêrîn hez ji çi dikin û hez ji çi nakin.

| | Sêv | Nan | Trî | Çay | Goşt | Şîr | Hirmî |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Ehmed | + | – | + | – | – | | |
| Fexrî | | | | | | | |
| Elî | | | | | | | |
| Gulê | | | | | | | |
| Zêrîn | | | | | | | |

Institut kurde de Paris

### *5 - Pirs û bersîvên jêrîn bixwîne.*

Kî hez ji çayê dike?

Elî hez ji çayê dike.

Kî hez ji sêvan dike?

Ehmed û Gulê hez ji sêvan dikin.

Kî hez ji goştî nake?

Ehmed, Elî û Gulê hez ji nanî nakin.

### *6 - Bersîvên pirsên jêrîn bide.*

Kî hez ji tirî dike?

Kî hez ji tirî nake?

Fexrî hez çi dike?

Zêrîn hez çi nake?

Kî hez ji hirmiyan dike?

Kî hez ji şîr dike?

### *7 - Niha rabe ser piyan û pirsa hinek hevalên xwe bike:*

Tu hez ji çi dikî?
***Dûv re raporekê çêke.***
Wisa dest pê bike: Narîn hez ji çayê dike. Şêrîn û Mirad hez ji şîr dikin.

..........................................................................................
..........................................................................................
..........................................................................................
..........................................................................................
..........................................................................................
..........................................................................................
..........................................................................................
..........................................................................................
..........................................................................................
..........................................................................................
..........................................................................................
..........................................................................................
..........................................................................................
..........................................................................................

Institut kurde de Paris

## 5 C

### 1 - Jiyan, rabûn, şuştin, xwarin, kar kirin, çûyin. Van lêkeran di nav tekstê de peyda bike.



Ez mamoste me. Navê min Yezdan e. Ez li Kerkûkê dijîm. Ez beyanî zû radibim û çavê xwe dişom. Paşî, taştê dixwim û diçim kar. Ez di dibistaneke dûr de kar dikim. Min sih û pênç xwendekar hene; panzdeh keç in û bîst kur in. Ez gelek hez ji wan dikim. Ez saet penç û nîvanda dizivirim mala xwe. Paşî şîv xwarinê ez rojname, pirtûk dixwinim û temaşe televîzyon dikim. Ez saet yanzdehan da dinivim.

### Pirsiyarên jêrîn bersiv bidin.

1- Ew çi kardike?
2- Navê wî çî ye?
3- Ew li ku derê dijî?
4- Ew çi dem radibe?
5- Ew beyanî çi dike?
6- Dibistana wî dûr e an jî nîzîk e?
7- Ewî çend xwendekar hene?
8- Ew hez ji çi dike?
9- Ew kengî dizivire mala xwe?
10- Ew şevê çi dike?

### 2 - Teksta jêrîn bixwîne û bersivên pirsan bide.



Rizgîn rojê donzdeh saetan kar dike. Karê Rizgîn giran e. Ew beyanî saet di pêncan de radibe û diçe kar. Ew saet di şeşan de dest bi kar dike. Rizgîn heta saet donzdehan dixebite û paşî firavîn dixwe. Saet di yekê de dîsa dest bi xebata xwe dike û heta saet heftan dixebite. Paşî ku wî karê xwe xelas kir, ew diçe mal û saet di heştan de şîv dixwe. Rizgîn, bi şevê rojnameyê dixwîne, temaşeya televîzyonê dike û saet di danzdehan de dinive.

### 3 - Bersivên pirsên jêrîn bidin.

Çima karê Rizgîn giran e?

.........................................

Rizgîn saet di çendan de radibe?

.........................................

Ew beyanî heta saet çendan dixebite?

.........................................

Kengî ew firavîn dixwe?

.........................................

Kengî ew dîsa dest bi kar dike?

.........................................

Ew êvarî heta saet çendan dixebite?

.........................................

Piştî karê wî xelas dibe, ew çi dike?

.........................................

Kengî ew dinive?

.........................................

G. 23 

### *3 - Guhdarî diyaloga jêrîn bike û bersîvên Yezdan binivîse.*

*Berfîn:* Mamoste Yezdan, ez dixwazim hinek pirsan ji te bikim.
*Yezdan:* Kerem bike.
*Berfîn:* Tu beyanî kengî radibî?
*Yezdan:* ________________________________
*Berfîn:* Paşî tu çi dikî?
*Yezdan:* ________________________________
*Berfîn:* Tu kengî dest bi kar dikî?
*Yezdan:* ________________________________
*Berfîn:* Karê te giran e an jî hesanî ye?
*Yezdan:* ________________________________
*Berfîn:* Tu hez ji karê xwe dikî an jî ne?
*Yezdan:* ________________________________
*Berfîn:* Zor spas mamoste Yezdan. Ez dikarim pirseke din jî ji te bikim?
*Yezdan:* Belê belê kerem bike.
*Berfîn:* Tu bi şev çi dikî?
*Yezdan:* ________________________________

Institut kurde de Paris

### *4 - Niha didu didu bixebitin û pirsên jêrîn ji hev bikin. Bersîvên hevalê/a xwe binivîse.*

***Mînak:*** A: Tu beyanî kengî radibî?
B: Ez di saet heftan de radibim.

1. Tu kengî taştê dixwî?
......................................
2. Tu kengî diçî kar /dibistanê?
......................................
3. Tu kengî firavîn dixwî?
......................................
4. Tu kengî xebata xwe xelas dikî?
......................................
5. Kengî tu diçî mala xwe?
......................................
6. Tu bi şevê çi dikî?
......................................

### *5 - Di heqê hevalê xwe de paragrafekê binivîse.*

*Wisa dest pê bike:* Serdar beyanî saet di heştan de radibe.
Ew ......................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................................

## 1 - Saet çend e?

***Guhdarî bike û bixwîne.***



Saet sisê ye.



Saet ji siseyan çarêk dibore.



Saet ji sisêyan bîst (deqîqe) dibore.



Saet sisê û nîv e.



Saet ji çaran bîst û pênc kêm e.



Saet ji çaran çarêk kêm e.



Saet ji çaran deh kêm e.



Saet çar e.

***Niha tu bibêje ka saet çend e û binivîse.***



..........................



..........................



..........................



..........................



..........................



..........................



..........................



..........................

| 7:20 | 8:30 | 9:45 | 10:55 |
|---|---|---|---|
| Saet heft û bîst e. | .......................... | .......................... | .......................... |

Institut Kurde de Paris

## 5 D - BAHOZ ROJA ŞEMIYÊ NAÇE DIBISTANÊ.

### *1 - Teksta jêrîn bi peyvên di nav çarguşê de tijî bike.*

Bahoz li zanîngehê xwendekar e. Ew roja Şemiyê dereng ................ Bahoz roja Şemiyê saet di deh û nîvan de ................ dixwe. Paşî hingî, ew rojname ................ Bahoz saet di donzdehan de rojname ................ Paşî rojnamexwendinê ................ diçe seredana hevalên xwe. Bahoz û hevalên wî carcaran diçin sînemayê an jî şanoyê.

| | | | |
|---|---|---|---|
| Dikire | heta | wî | diçe |
| Ew | radibe | dixwîne | sertêşt |

Institut kurde de Paris

### *2 - Bi peyvên jêrîn paragrafekê di heqê rojeke xwe ya ji rêzê de binivîse.*

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Beyanî | xwarin | çûn | kar kirin | şûştin | rabin |
| Xelas | nîvro | firavîn | rojname | xwendin | şev |
| Şîv | nivistin | televizyon | temaşe kirin | taştê | heta |
| saet | paşî | serdan | heval | pirtûk | |

***Lê binêrin û cudahiya navbera her du tabloyan bibêjin.***

*Mînak:*

Ez li Enqereyê dijîm. Ez beyanî di heft û nîvan de radibim. ....................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

### *3- Didu didu bixebitin û di heqê Bahoz de (5D 1) pirsan bikin û bersivan bidin.*

*Mînak:*

Bahoz li ku derê xwendekar e?

...............................................

Ew roja şemiyê kengî radibe?

...............................................

Ew çi demê taştê dixwe?

...............................................

Ew paşî çi dike?

...............................................

Bahoz heta saet çendan rojnameyê dixwîne?

...............................................

Paşî rojnamexwendinê ew çi dike?

...............................................

***Lê binerîn û bersîva pirsîyaran bidin.***

<table>
<tr><td>Ez</td><td rowspan="4">hez jî aşitî</td><td>dikim</td></tr>
<tr><td>Tu</td><td>dikî</td></tr>
<tr><td>Ew<br>Ew</td><td>dike</td></tr>
<tr><td>Em<br>Hûn<br>Ew</td><td>dikin</td></tr>
</table>

<table>
<tr><td>Ez</td><td rowspan="4">hez jî şer</td><td>nakim</td></tr>
<tr><td>Tu</td><td>nakî</td></tr>
<tr><td>Ew<br>Ew</td><td>nake</td></tr>
<tr><td>Em<br>Hûn<br>Ew</td><td>nakin</td></tr>
</table>

***4 - Dema niha bi kar bînin û lêkeran li bin cînavkan binivîsin.***

| | Ez | Tu | Ew | Em/Hûn/Ew |
|---|---|---|---|---|
| *Mînak*: jiyan | dijîm | dijî | dije | dijîn |
| xwarin | | | | |
| axaftin | | | | |
| bezîn | | | | |
| çûn | | | | |
| nivistin | | | | |
| xwestin | | | | |

Institut kurde de Paris

***5 - Dema niha bi kar bînin û lhevokên jêrîn bi bêjeyên li nav kevanada kuta bikin.***

1- Ez dinivim. (nivistin)
2- Şîlan ............ (bezîn)
3- Tu ............ (xwendin)
4- Çelo û Feşo xwarin ............ (xwarin)
5- Em ............ (axaftin)

***6 - Vê carê dema niha neyînî bikar bînin û hevokan bi bêjeyên di nav kevanan de kuta bikin.***

1- Ez niha pirtûk ................... (na/xebitîn)
2- Şemam û Şazê ................... zozanan.(na/çûn)
3- Em îro ................... (naxebitin)
4- Beybûn çima ...................? (nivistin)
5- Tu me ................... (na/dîtin)

Institut kurde de Paris

***Bêjeyên girîng ji bo bîranînê.***

| | | |
|---|---|---|
| hûlî | av | rabûn |
| mûz | bestenî | xebitîn |
| hirmî | qehwe | xwarin |
| xox | zebeş | xwendin |
| hinar | hezkirin | nivistin |
| şîr | taştê | firavîn |
| nan | dibistan | |
| goşt | xwendekar | |
| çay | mamoste | |

***7 - Bi bêjeyên jorîn deh hevokan çêkin.***

1- ............................................................................................................
2- ............................................................................................................
3- ............................................................................................................
4- ............................................................................................................
5- ............................................................................................................
6- ............................................................................................................
7- ............................................................................................................
8- ............................................................................................................
9- ............................................................................................................
10- ..........................................................................................................

# UNÎTE 6

## 6 A - TU ÇIQASÎ LI TELEVÎZYONÊ TEMAŞE DIKÎ?

% 0 — % 100

tu caran — kêm caran — carina (hinek caran) — gelek (zor caran) — hemû caran

G. 24 **_1 - Niha guhdarî diyaloga jêrîn bike û cihên vala tijî bike._**



*Bahoz:* Beyanî baş, mamoste.
*Yezdan:* Beyanî baş, Bahoz.
*Bahoz:* Mamoste ez dikarim hinek pirsan ji te bikim?
*Yezdan:* Di dabaşa çi de?
*Bahoz:* Di dabaşa jiyana te de.
*Yezdan:* Belê, ................ ................
*Bahoz:* Tu beyanî çi demê radibî?
*Yezdan:* ................ ................
*Bahoz:* Tu diçî sînemayê an jî şanoyê?
*Yezdan:* Belê, ................
*Bahoz:* Tu cigarê dikşînî?
*Yezdan:* Na, ez ................ ................ ................
*Bahoz:* Tu dawiya heftiyê diçî geriyanê?
*Yezdan:* Belê, ez dawiya hefteyê diçim nik hevalên xwe.
*Bahoz:* Tu di betlanê de, diçî cihekî an na?
*Yezdan:* Betlanê? Betlana min nîne ji ber ku ez havînê jî dixebitim.

Institut kurde de Paris

### *2 - Bi peyvên jêrîn hevokan çêke.*

*Mînak:* Cigarê/ tu caran/ nakşîne /ew
Ew tu caran cigarê nakşîne.

Diçin / em/ car caran / şanoyê

...............................................................

Hemû caran / taştê / ez / dixwim

...............................................................

Ez / welêt / gelek caran / beyanî / diçim

...............................................................

Dilşad / vedixwe /şîr / beyanî / hemû caran

...............................................................

Şîlan û Dîlan / temaşe / televîzyonê/ li/ dikin /kêm caran

...............................................................

Tu /werzîş/ tu /caran / nakî

...............................................................

Ew / tenîs / carcaran / dileyizin

...............................................................

Hûn / dinivin / zû / gelek / caran

...............................................................

Em / dibezin / beyanî / hemû caran

...............................................................

Şîrvan / derewan / tu caran / nake

...............................................................

G. 25

### *3 - Niha guhdarî hevokên jêrîn bike û biryar bide kî ji wan pirs in, kî ji wan ne pirs in.*

*Mînak:*

................

Tu karker î (Pirs e)

......................

Ew pirtûk dixwîne (Ne pirs e)

................

Tu karker î (Ne pirs e)

......................

Ew pirtûk dixwîne (Pirs e)

Institut kurde de Paris

( P: Pirs, NP: Ne pirs)

| | P | NP |
|---|---|---|
| Şîlan doxtor e | | |
| Yezdan mamoste ye | | |
| Tu nexweş î | | |
| Ew nexweş e | | |
| Yezdan ji xwendekaran hez dike | | |
| Tu ji fêkî hez dikî | | |
| Dilvan zarok e | | |
| Te sar e | | |
| Hûn rast dibêjin | | |
| Rimdar xwarin dixwe | | |

Institut kurde de Paris

***4 - Hevaxaftinekê li gel mamosteyê xwe bikin. Hinek pirsan di heqê jiyana wî de bikin.***

1- Tu beyanê çi demê radibî?

.....................................................

2- Tu di saet çendan de taştê dixwî?

.....................................................

3- Tu ji xwendinê hez dikî?

.....................................................

4- Tu çi dixwînî?

.....................................................

5- Jina/Mêrê te heye?

.....................................................

6- Tu çi demê dest bi kar dikî?

.....................................................

7- Tu kengî firavîn dixwî?

.....................................................

8- Tu kengî karê xwe diqedînî?

.....................................................

9- Tu kengî diziviri mala xwe?

.....................................................

10- Tu bi şevê çi dikî?

.....................................................

11- Tu dawiya hefteyê çi dikî?

.....................................................

12- Tu ji mûzîkê hez dikî?

.....................................................

14- Tu çend zimanan diaxivî?

.....................................................

15- Tu dema betlaneyê çi dikî?

.....................................................

16- Tu werzîşê dikî?

.....................................................

17- Tu kîjan werzîşê dikî?

.....................................................

18- Tu kîjan rojnameyê dixwînî?

.....................................................

19- Çend xwîşk û birayên te hene?

.....................................................

20- Çend zarokên te hene.

.....................................................

21- Tu ji sînema an jî şanoyê hez dikî?

.....................................................

Institut kurde de Paris

***5 - Hevaxaftinekê li gel xwendekarekî/ê bike. Bersîvên wî/wê binivîse.***

***6- Niha paragrafekê der barê xwendekarê ku te li gel axaftin kir de, binivîse.***

***Mînak:*** Gulê Beyanî zû radibe, taştê dixwe û di saet heştan de diçe dibistanê........................

## 6 B

### *1- Berê xwe bide teksta der barê Rizgîn de (Unîte 5) û hevokên jêrîn ên xelet rast bike û neyîniya wan binivîsîne.*

*Mînak:* Rizgîn rojê şeş saetan kar dike.
Na, Rizgîn rojê şeş saetan kar nake. Rizgîn rojê donzdeh saetan kar dike.

1- Karê Rizgîn gelek hêsan e.
.......................................................
2- Ew beyanî di saet heştan de radibe.
.......................................................
3- Rizgîn diçe dibistanê.
.......................................................
4- Rizgîn di saet dehan de dest bi kar dike.
.......................................................
5- Ew heta saet nehan dixebite.
.......................................................
6- Ew paşî saet çaran diçe malê.
.......................................................
7- Rizgîn bi şevê pirtûkan dixwîne.
.......................................................
8- Ew bi şevê temaşeya televîzyonê dike.
.......................................................
9- Ew di saet dehan de dinive.
.......................................................

### *2 - Didu didu bixebitin. Pirsan bikin û bersîvan bidin.*

| | Rabûn | Çûna kar/ Dibistan | Firavîn xwarin | Kar/dibistan qetandin | Şev | Nivistin |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Rizgîn | 5:00 | 5:30 | di karxanê de | 7:00 | - Rojname xwendin<br>- Temaşeya TV | 11:00 |
| Yezdan | 7:00 | 7:00 | di dibistanê de | 5:30 | - Rojname-pirtûk xwendin<br>- Temaşeya TV | 11:00 |
| Bahoz | 8:00 | 8:30 | di mal de | 4:00 | - Ders kirin<br>- Rojname-pirtûk xwendin<br>- Temaşeya TV | 12:00 |
| Belkis | 7:00 | | di mal de | | - Zarok dinivîne<br>- Temaşeya TV | 12:00 |

*Mînak:*
1 - Rizgîn kengî radibe?
2 - Ew li ku derê firavîn dixwe?
3 - Ew bi şevê çi dike?
4 - Bahoz kengî dinive?
5 - Belkîs bi şevê çi dike?

### *3 - Paragrafekê di heqê Rizgîn, Yezdan, Bahoz, an jî Belqîsê de binivîse.*

*Mînak:* Rizgîn di saet pêncan de radibe. Ew saet 5:30 diçe dibistane...............................

### *4 - Didu didu bixebitin. Paragrafa xwe ji bo hevalê xwe bixwîne, paşî ji*



Institut Kurde de Paris

## 6 C - HÛN WAN DINASIN?

### *XWENDIN*

***1- Beriya xwendinê bersîvên pirsên jêrîn bidin.***



1- Ew kî ne?
2- Ew ji ku derê ne?
3- Ew çend salî ne?
4- Ew jin û mêr in, an jî na?
5- Wan çi heye çi nîne?
6- Hûn di heqê wan de çi dizanin?

Rojbaş navên me Gulê û Naman e. Her wekî hûn dizanin em ji Şemzînanê ne. Em jin û mêr in. Em li gundekî biçûk dijîn. Navê gundê me Sererû ye. Em rêncber in.
Em karê giran nakin, ji ber ku êdî em pîr in. Lê belê em dîsa alîkariya zarokên xwe dikin. Em karê sivik dikin.

Em bostan av didin, tutunê av didin û fêkî berhev dikin.
Em car caran digerin û diçin seredana mirovên xwe û hevalên xwe. Me gelek xizm û heval li gundên cîranê me hene. Em diçin mêvandariya wan û ew jî tên mêvandiriya me. Rojên me wisa derbas dibin.

*Wan pirsan bibersîvînin.*

1- Ew li ku derê dijîn?
........................................................

2- Ew û zarokên wan çi karî dikin?
........................................................

3- Ew ji bo çi karê giran nakin?
........................................................

4- Ew çawa alîkariya zarokên xwe dikin?
........................................................

5- Ew carcaran çi dikin?
........................................................

6- Xizmên wan li ku derê hene?
........................................................

7- Ew diçin mêvandariya kê?
........................................................

## 2- Cînavkên teksta xwendinê biguhere û ji nû ve binivîse.

*Wîsa dest pê bike:*

Navên wan Gulê û Naman e. Her wekî em dizanin ew ji Şemzînanê ne. ..........

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

Nivîsa xwe ji bo hevalê xwe bixwîne.

## 3- Hevokên jêrîn bikin neyînî.

***Mînak:*** Ez pirtûkê dixwînim.
Ez pirtûkê naxwînim

1- Tu beyanî dibezî.

........................................................

2- Ew bersîvên pirsan didin.

........................................................

3- Em dixwazin li televîzyonê temaşe bikin.

........................................................

4- Hûn gelek dereng dinivin.

........................................................

5- Ew bi dengekî nizim diaxivin.

........................................................

6- Ew bi dengekî bilind diaxive

........................................................

7- Ez te dibînim.

........................................................

8- Ew aşîtiyê dixwazin.

........................................................

9- Hûn parêzer in.

........................................................

10- Ew li bajêr dijîn.

........................................................

Institut kurde de Paris

## 6 D - EZ DIXWAZIM TE BIKIM MÊVAN

G 26 **_1- Diyaloga jêrîn guhdarî bike, lê vegerîne û bixwîne._**

*Bahoz:* Elo, şev baş. Şermîn tu yî?
*Şermîn:* Şev baş. Belê ez im, tu kî yî?
*Bahoz:* Ez Bahoz im.
*Şermîn:* Ha, Bahoz. Tu çawa yî?
*Bahoz:* Ez baş im. Zor spas. Tu çawa yî?
*Şermîn:* Ez jî baş im. Zor spas. Kerem bike?
*Bahoz:* Ez dixwazim te şevekê bikim mêvan.
*Şermîn:* Şeva yekşemê nabe. Ez diçim sînemayê.



*Bahoz:* Şeva duşemê?
*Şermîn:* Nabe. Ez diçim konserê.
*Bahoz:* Şeva sêşemê?
*Şermîn:* Sêşem jî nabe.
*Bahoz:* Çarşem?
*Şermîn:* Şeva çarşemê ez dixebitim.



*Bahoz:* Pêncşem?
*Şermîn:* Pêncşem jî nabe. Ez diçim mêvandariyê.
*Bahoz:* Şeva înê?
*Şermîn:* Şeva înê min mêvan hene.
*Bahoz:* Şemî?
*Şermîn:* Şemî, ka ez li bernameya xwe binêrim. Şemî jî nabe. Diya min dê were mala min.
*Bahoz:* De baş e Şermîn. Ser çavan.
*Şermîn:* Zor spas. Ser çavan.

Institut kurde de Paris

**_2- Biryar bide ka ev hevokên jêrîn rast in (r) an jî xelet in (x)_**

1- Şermîn dixwaze Bahoz mêvan bike. --------------------
2- Şeva yekşemê Bahoz diçe sînemayê. --------------------
3- Şeva duşemê Şermîn diçe konserê. --------------------
4- Şermîn naxwaze şeva sêşemê biçe mala Bahoz. --------------------
5- Şermîn û Bahoz şeva çarşemê dixebitin. --------------------
6- Bahoz şeva pêncşemê mêvanê Şermînê ye. --------------------
7- Şeva înê Şermîn mêvanê Bahozî ye. --------------------
8- Şermîn biryar da ku şeva şemiyê ew bibe mêvanê Bahozî. --------------------
9- Şeva şemiyê xwîşka Şermîn dê were seredana wê. --------------------
10- Şermîn naxwaze bibe mêvanê Bahozî. --------------------

### 3- Niha hevokên jorîn ên xelet rast bikin.

*Mînak:* 1- Na, Şermîn naxwaze Bahoz mêvan bike.

.......................................................................................................

.......................................................................................................

.......................................................................................................

.......................................................................................................

.......................................................................................................

### 4- Rojên heftiyê di nav tekstê de peyda bikin û binivîsin.

1- Yekşem 3- ........... 5- ........... 7- ...........

2- ........... 4- ........... 6- ...........

### 5- Tu vê heftiyê çi dikî? Bernameya xwe binivîse.

| | Beyanî | Êvar | Şev |
|---|---|---|---|
| Şemî | | | |
| Yekşem | | | |
| Duşem | | | |
| Sêşem | | | |
| Çarşem | | | |
| Pêncşem | | | |
| În | | | |

Institut kurde de Paris

### *6- Didu didu bixebitin û di heqê bernameya hevalê xwe de pirsan bikin.*

***Mînak:*** Tu roja şemiyê beyanî çi dikî?
Ez diçim qursa kurdî.

Tu roja sêşemê evarê çi dikî?
Ez diçim dibistanê.

Bêjeyên girîng ji bo bîranînê

| | | |
|---|---|---|
| Çi caran | welatê biyan | rêncber |
| kêm caran | xwarin | xizm |
| carcaran | vexwarin | mêvandarî |
| Hindek caran | sertêşt | cîran |
| gelek caran | temaşe kirin | şemî |
| hemû caran | werzîş kirin | yekşem |
| şano | leyîztin | duşem |
| havîn | nivistin | sêşem |
| betlane | kîjan | çarşem |
| xebat | pêşî | pêncşem |
| xebitîn | paşî | în |
| bername | xwestin | kengî |
| biryar dan | pejirandin | beyanî |

Institut kurde de Paris

### *7- Deh peyvan, ji lîsteya jorîn hilbijêre û deh hevokan ji wan çêbike.*

***Mînak:*** Ez havînê diçim Kurdistanê.

........................................................................................................................
........................................................................................................................
........................................................................................................................
........................................................................................................................

***Van hevokan bixwînin û lêkerên din bikar bînin.***

***XWESTIN***

erênî

| | | |
|---|---|---|
| Ez | dixwazim | binivim |
| Tu | dixwazî | binivî |
| Ew<br>Ew | dixwaze | binive |
| Em<br>Hûn<br>Ew | dixwazin | binivin |

neyînî

| | | |
|---|---|---|
| Ez | naxwazim | binivim |
| Tu | naxwazî | binivî |
| Ew<br>Ew | naxwaze | binive |
| Em<br>Hûn<br>Ew | naxwazin | binivin |

***Niha hevokên jêrîn bi bêjeyên di nav kevanan de bi forma <u>bilanî</u> û dema niha kuta bikin.***

1- Hûn dixwazin ........................ şanoyê.(çûn)
2- Em dîxwazin zimanê xwe ........................ (axaftin)
3- Ez naxwazim ........................ (nivistin)
4- Ew naxwazin rojname ........................ (xwendin)
5- Tu dixwazî kar ........................ (kirin)
6- Ew dixwaze ........................ (bezîn)

***"Ma" bikarbînin û hevokên jerî bikin pirsyarkî.***

*Mînak*: Tu xweş î
Ma tu nexweş î?

1- Ew diçe dibistanê
........................................................?
2- Îro çarşem e
........................................................?
3- Hûn dîn in
........................................................?
4- Sorgul jina Rênasi ye
........................................................?
5- Şîlan xwendekar e
........................................................?

# UNÎTE 7

## 7 A

### 1- Ew bi çendê ye?

G. 27

***Guhdarî diyaloga jêrîn bike.***



| | |
|---|---|
| *Bikir:* | Êvar baş. |
| *Dikandar:* | Êvar beş. |
| *Bikir:* | Ew pênûs bi çendê ye? |
| *Dikandar:* | Ew bi sed û pêncî hezarî ye. |
| *Bikir:* | Gelek giran e. |
| *Dikandar:* | Na, ne giran e. Gelek erzan e. |

### 2- Ew tiştên jêrîn bi çendê ne?



Sîwan
3 milyon



Kompîtûr
200 milyon



Rojname
100 hezar



Berçavik
20 milyon



Sê pirtûk
6 milyon

### 3- Niha ji hevalê xwe bipirse.

*Mînak:* A: Ew bi çendê ye?
B: Ew bi 50 milyonî ye.

G. 28

### 4- Niha guhdarî bikin û cihên vala tijî bikin.

*Bikir:* Kîloya sêvan .... çendê ye?
*Mêwefiroş:* Sed û ...... hezar.
*Bikir:* Du kîloyên hirmiyan bi çendê ne?
*Mêwefiroş:* Du sed û ..... hezar.
*Bikir:* Ka ji bo min kîloyek sêv û du kîlo hirmî bipîve.
*Mêwefiroş:* Kerem bike. Sê sed û..... hezar
*Bikir:* Kerem bike.

Institut kurde de Paris

***5- Niha pirs û bersîvan binivîse.***

| | |
|---|---|
| *Mînak:* | Cotek goran bi çendê ye?<br>Cotek goran bi 800 hezarî ye. |
| **Pêlav** | 15 milyon |
| **Gore** | 800 hezar |
| **Şelwar** | 11 milyon |
| **Derpê** | 1 milyon |
| **Kiras** | 10 Milyon |
| **Kurtek** | 1 milyon |
| **Kulav** | 6 milyon |

1- .......................................................?

.......................................................

2- .......................................................?

.......................................................

3- .......................................................?

.......................................................

4- .......................................................?

.......................................................

5- .......................................................?

.......................................................

6- .......................................................?

.......................................................

Institut kurde de Paris

***6- Didu didu bixebitin. Yek ji we mêwefiroş e, yek jî bikir e.***

***Herwekî diyaloga jorîn hûn jî bi hindek bêjayên jêrîn diyalogekê binivîsin.***

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Zebeş | Hûlî | Gindor | Zerdalî | Bacan | Hinar |
| Xiyar | Kelem | Bacana sor | Pirteqal | Bihok | Xox. |

## 7 B

### 1- Ez dikarim bi frensî biaxivim, belê ez nikarim binivîsim.

**KARÎN**

| | |
|---|---|
| Ez dikarim | bi frensî biaxifim |
| Tu dikarî | bi frensî biaxifî |
| Ew dikare | bi frensî biaxife |
| Em<br>Hûn dikarin<br>Ew | bi frensî biaxifin |
| Ez nikarim | bi frensî binivîsim |
| Tu nikarî | bi frensî binivîsî |
| Ew nikare | bi frensî binivîse |
| Em<br>Hûn nikarin<br>Ew | bi frensî binivîsin |

| | |
|---|---|
| ingilîzî axiftin | xwarin çêkirin |
| avjenî kirin | xweş bezîn |
| seyare ajotin | kompitor xebitandin |
| hesp ajotin | |

Kîjan tiştên jorîn tu dikarî bikî?
Kîjan tu nikarî bikî?

*Mînak:* Ez dikarim bi ingilîzî biaxivim, belê ez nikarim binivîsim.

G. 29

### 2- Guhdarî bike û cihên vala tijî bike.

*Merwan:* Şadil tu dikarî kurdî bixwînî?
*Şadil:* Belê, ez............. û hem jî............
*Merwan:* Tu dikarî avjenî bikî?
*Şadil:* Na, ez ........... avjenî bikim.
*Merwan:* Çima?
*Şadil:* Ji ber ku li gundê me çi rûbar û gol nîn in.

### 3- Pirsa hevalê xwe bike. Ew dikare çi bike û çi nake.

**Paşî di heqê hevalê xwe de hindek hevokan binivîse.**

*Mînak:*
Sorgul dikare kompîtûr bixebitîne, belê ew nikare dûrnivîsê bixebitîne.

Institut kurde de Paris

## XWENDIN

### 1- Teksta jêrîn bixwîne û bersîvên pirsan bide.



Zelal û Lezgîn her du li Enqereyê xwendekar in. Zelal ev çar sal e ku li Enqereyê dijî û ew diçe zanîngeha amojkariyê. Ew dixwaze dibistana xwe zû biqedîne û bibe mamosteya matematîkê. Wê gelek bêriya welatê xwe û gelê xwe kiriye. Ew dixwaze bizivire welatê xwe. Ew dixwaze dersê bide zarokên gelê xwe. Lezgîn jî ev çar sal e ku li Enqereyê dijî û ew jî diçe zanîngeha bijişkiyê. Ew dixwaze bibe bijîşk. Ew dizane ku gelek nexweşî, nesaxî, derd û xem û kul di nav gelê wî de hene. Ji ber vê hindê, Lezgîn jî dixwaze zû zanîngeha xwe biqedîne û biçe nav gelê xwe.
Zelal û Lezgîn xwendekarên gelek zîrek û serfiraz in.

Institut kurde de Paris

### 2- Pirsên jêrîn bersîv bide

1- Zelal û Lezgîn çi karî dikin?
........................................................
2- Ew li ku derê dijîn?
........................................................
3- Zelal diçe kîjan zanîngehê?
........................................................
4- Zelal dixwaze bibe çi?
........................................................
5- Wê bêriya çi kiriye?
........................................................
6- Ew dixwaze dersê bide kî?
........................................................
7- Zelal dixwaze biçe ku derê, piştî ku wê dibistana xwe qedand?
........................................................
8- Lezgîn dixwaze bibe çi?
........................................................
9- Çima Lezgîn dixwaze dibistana xwe zû biqedîne?
........................................................
10- Zelal û Lezgîn xwendekarine çawa ne?
........................................................

### 3- Van bêjeyên jêrîn di nav tekstê de peyda bike û binê wan xîç bike.

Jiyan çûn xwestin qedandin zivirîn zanîn

***4- Binivîse tu dixwazî çi bikî?***

***Mînak:*** Ez dixwazim biçim seredana hevalên xwe. Ez dixwazim bibim sexmenkar ..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

***5- Niha pirsa hevalê xwe bike û bizane ew dixwaze çi bike û çi neke.***

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

Institut kurde de Paris

## 1- Cihên vala bi bêjeyên jêrîn tijî bikin, belê divê hûn forma wan bêjeyan biguherin.

| | | |
|---|---|---|
| Xebitîn | xwarin | vexwarin |
| kêşan | rabûn | nivistin |
| çûn | xwendin | axaftin |
| xwestin | karîn | nivîsandin |
| jiyan | bezîn | zanîn |
| qedandin | bûn | heyîn |

1- Sorgul û Zînê niha xoxan ................
2- Şîrvan heta saet yekê şevê ................
karê wî ne hêsan e.
3- Ez her roj beyanî şîr ................
4- Roza tu caran cigareyê ................
5- Em beyanî dereng ................
6- Divê zarok şevê zû ................
7- Hûn dixwazin ji bo
welat ................
8- Em bi frensî ................
9- Ez dikarim bîst
kîlometreyan ................
10- Zerê û Şemam
rojnameyê ................
11- Ajda û Perîxanê
rojname ................
12- Hûn divê karê xwe heta
saet pêncan ................
13- Zerdeşt dixwaze ................ parêzer
14- Hişyarî çar xwîşk ................
15- Kî dizane bi japonî ................
16- Sîbel û Sîdar li
ku derê ................?
17- Rihan niha nameyê ................?

## 2- Çar bêjeyên din li ser listeya jêrîn binivîse.

1- Şelwar, pêlav, ....................,
...................., ....................,
....................

2- Dûrnivîs, kompîtûr, ....................,
...................., ....................,
....................

3- Car caran, çi caran, ....................,
...................., ....................,
....................

4- Hinar, bihok, ....................,
...................., ....................,
....................

5- Şemî, Yekşem ....................,
...................., ....................,
....................

6- Xwarin, qedandin, ....................,
...................., ....................,
....................

Institut kurde de Paris

***3- Dijberên van bêjeyan binivîse.***

***Mînak***: Zû X Dereng

| | | |
|---|---|---|
| Mêr | Nû Wî | Nivîstin |
| Dijmin | Nexweşî | Ciwan |
| Germ | Teral | Şev |

Rabûn X ..................

Pîr X ..................

Kevn X ..................

Jin X ..................

Roj X ..................

Zîrek X ..................

Sar X ..................

Dost X ..................

Wê X ..................

Xweşî X ..................

Institut kurde de Paris

***Deh hevokan bi lîsteya jêrîn çêbikin.***

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Karîn | Dûrnivîs | Jiyan | Zû | Dereng | Xwendin |
| Mijik | Çûn | Xwestin | Xebitîn | Navpêş | Divê |
| Avjenî | Zîrek | Nexweşî | Ajotin | Zanîngeh | Xem |
| Zivirîn | Zanîn | Kişik | Ji ber ku | Nivîsandin | Bêrîkirin |
| Serfiraz | Nesaxî | Qedandin | Ji bîr kirin | | |

1- ....................................................

2- ....................................................

3- ....................................................

4- ....................................................

5- ....................................................

6- ....................................................

7- ....................................................

8- ....................................................

9- ....................................................

10- ....................................................

## LÊ BINÊRIN Û BERSÎVA PIRSAN BIDIN

A: "Ev pirtûk bi çi qasî ye?" (2 milyon)
B: "Ev pirtûk bi du milyonan e."
A: "Ev her du pênûs bi çi qasî ne?" (200 hezar)
B: "Ev her du pênûs bi dused hezaran e."

***1- Dan û standinên jêrîn wekî ku me li jorîn çêkir kuta bikin.***

1- A: "Kîloya sêvan bi çi qasî ye?" (500 hezar)
B: "........... .......... ........ .............. ............ ."
2- A: "Du kîlo bacan bi çi qasî ye?"
B: "........... ........... ............. .......... ."
3- A: "Ew desta cilan bi çi qasî ye?"
B: "......... .......... ......... ......... ............ ....... ."
4: A: "............ ........... .......... .......... ... ?" (500 hezar)
B: "Du kîlo hirmî bi pênsed hezaran e"

Institut kurde de Paris

## *KARÎN*

ERÊNÎ

| | | |
|---|---|---|
| Ez | dikarim | avjenî bikim |
| Tu | dikarî | avjenî bikî |
| Ew<br>Ew | dikare | avjenî bike |
| Em<br>Hûn<br>Ew | dikarin | avjenî bikin |

NEYÎNÎ

| | | |
|---|---|---|
| Ez | nikarim | avjenî bikim |
| Tu | nikarî | avjenî bikî |
| Ew<br>Ew | nikare | avjenî bike |
| Em<br>Hûn<br>Ew | nikarin | avjenî bikin |

Institut kurde de Paris

***2- Dema niha bi kar bînin û hevokan bi <u>"karîn"</u> û forma <u>bilanî</u> biqedînin.***

*Mînak:* Ez <u>dikarim</u> traktor <u>biajom</u>.(karîn)

1- Em .................(karîn) kurdî .............(axaftin)
2- Çelo ...............(karîn) avjenî ............(kirin)
3- Ez ............. (nekarîn) firoke ...........(firandin)
4- Tu ...............(karîn) xweş .............(bezîn)
5- Hûn ........... (karîn) beyanê ...........(çûn)
6- Zerdeşt .............(karîn) kompîtur ...............(xebitandin)
7- Zêrê ..............(nekarîn) baş ............... (dîtin)
8- Ew ...............(nekarîn) ..................(xwendin). Çavên wê baş nabînin.
9- Zarok ............(nekarîn) cilên xwe ...........(bişon)
10- Feşo .............(karîn) gelek tiştan ...........(kirin)

# UNÎTE 8

## 8 A - JI TE WERE KÎJAN DEMSAL XWEŞTIR E?

### *1 - BIHAR - HAVÎN - PAYÎZ - ZIVISTAN*

Kîjan tekst derbarê kîjan fotoxrafî de ye?






........................ ........................ ........................ ........................

**a)** Zivistan gelek sar e. Li walatê min zivistanê gelek berf dibare. Rêyên bajar û gundan têne girtin. Li serê çiyan nêzîkî sê metroyan berf heye.

**b)** Bihar xweştirîn demsal e. Ez pir hez ji biharê dikim. Ji ber ku bihar li Kurdistanê heftrengîn e. Li ser çiyayên me gelek kulîlkên rengîn wekî helal, beybûn, sosin, gulexwîn û binevş vedibin. Bihar herwekî jiyaneke nû ye.



**c)** Em gelek hez ji havînê dikin. Havîn germ e û em dikarin avjeniyê bikin, em dikarin biçin zozanan serê çiyayên bilind. Em tu caran havînê di mal de namînin.

**d)** Payîzê gelek baran dibare. Pelgên daran zer û sor dibin û diweşin. Rengên wan pir delal in. Rêl, di payîzê de gelek ciwan e û hemû reng kesk, sor, zer, binevşî, qehweyî di nav de hene.

Institut kurde de Paris

### *2- Kîjan hevok xelet in (x), kîjan rast in (r). Hevokên xelet rast bikin.*

1- Havîn germ e. (R)
2- Ew hemûaran havîne ji derdikevîn ( )
3- Payîzê pir berf dibarê ( )
4- Kulîlkên rengîn zivistanê vedibin ( )
5- Payîzê rê nayên girtin ( )
6- Zivistan ji hemû demsalan xweştir e ( )
7- Bihar belgên daran diweşin ( )

### *3- Mehên salê guhdarî bikin û dûv re bibêjin.*

| | | |
|---|---|---|
| Adar | Avrêl | Gulan |
| Pûşper | Tîrmeh | Gelawêj |
| Rezber | Kewçêr | Sermawez |
| Berfanbar | Rêbendan | Reşemî |

### *Mehên demsalan binivisin.*

| BIHAR | HAVÎN | PAYÎZ | ZIVISTAN |
|---|---|---|---|
| Adar | Pûşber | Rezber | Berfanbar |
| | | | |
| | | | |
| | | | |

Institut kurde de Paris

### *4- Bersîvên pirsan bidin.*

1- Sersala kurdan kengî ye?
..............................................................................
2- Rojbûna te kengî ye?
..............................................................................
3- Betlaneya te ya havînê kengî ye?
..............................................................................
4- Tu bêtir ji kîjan mehên salê hez dikî? Çima?
..............................................................................

***Niha didu didu bixebitin û pirsên jorîn ji hevala/hevalê xwe bikin.***

*Mînak:* Rojbûna te kengî ye?
Rojbûna min bîst û yekê gulanê ye.

### 1- Bêjeyên di nav kevanê de li rex rengan binivîsin.


..........................


..........................


..........................


..........................


..........................


..........................


..........................

Kesk    Şîn    Sor    Zer    Qehweyî    Spî    Reş

### 2- Rengên demsalan çi ne?

| Zivistan | Havîn | Bihar | Payîz |
|---|---|---|---|
| spî<br>reş<br>gewr | | | |

### 3- Cihên vala tijî bikin

*Mînak:* Rengê berfê spî ye

1- Rengê rojê .............
2- Rengê şevê ................
3- Rengê heyvê .................
4- Rengê giyayê ...............
5- Rengê porê min ...............
6- Rengê çavên min ...............

Institut kurde de Paris

### 4- Bersîvên pirsên jêrîn bidin

1- Çavên te çi reng in?

..................................................

2- Porê te çi reng e?

..................................................

3- Rengê aştiyê çi reng e?

..................................................

4- Rengê ku tu gelek hez jê dikî çi ne?

..................................................

5- Rengê asîmên çi ye?

..................................................

6- Ji te were rengê sor sembola çi ye?

..................................................

7- Reş rengê çi ye?

..................................................

## 8 C

### 1- Zarokatiya min



***Birûsk***: Ez bîst û pêncê heyva gulanê, di sala hezar û nehsed û çil û yekê de li gundekî Şemzînan, bi navê Şepeta, bûme. Dayîk û bavê min ne zengîn bûn. Bavê min cotkar bû. Dayîka min jî bêrîvan bû. Zarokatiya min gelek zor bû. Ez tu caran dilxweş nebûm, ji ber ku me gelek astengên aborî hebûn. Bavê min di sala 1945 an de mir. Hingî ez çar salî bûm. Piştî mirina bavê min jiyana me nexweştir bû. Bêkesî, belengazî û xizanî navên zarokatiya min bûn.

### Bersîvên pirsan bidin.

1- Birûsk kengî bû?
2- Ew li ku derê bû?
3- Dayîk û bavê wî çi kar dikirin?
4- Birûsk çend salî bû, gava ku bavê wî mir?
5- Birûskî çi astengiyên aborî hebûn?(Çi astengiyên Birûsk ên aboriyê hebûn)
6- Birûsk çima di zarokatiya xwe de dilxweş nebû?

## *2- Cihên vala tijî bikin.*

Navê min Elîşêr e. Ez panzdehê gelawêjê di .......... hezar û nehsed û pêncih û duyê de li bajarê Stenbolê ........ Bavê min mamostayê dîrokê .......... Dayîka min li nexweş-xaneyekê paqijker bû. Zarokatiya ......... gelek nexweş nebû. Em ne zengîn ......... ne jî xizan bûn. Dayîk û bavê min her du dixebitîn, ji ber wê hindê aboriya me gelekî ne xerab bû.

### *Pênc pirsîyaran der barê Elîşêr de bikin.*

1- .................................................
3- .................................................
2- .................................................
4- .................................................

## *3- Bi alîkariya bêjeyên di nav kevanê de paragrafekê der barê zarokatiya xwe de binivîsin.*

| |
|---|
| bûn, kar, xwendin, peyda bûn, astengên aborî, dilxweş bûn, dilnexweş bûn, bav, dayîk, xizanî, zarokatî, xebitîn, gund, jiyan, hingî, dewlemendî, sal, bajar, belangazî, heyv, hebûn |

## *4- Hindek pirsan ji hevalê xwe bikin û bersîvên wan binivîsin.*

Tu kengî bûyî?

..........................................................

Tu li ku derê bûyî?

..........................................................

Tu di zarokatiya xwe de dilxweş bûyî an jî dilnexweş bûyî?

..........................................................

Te hez ji çi dikir?

..........................................................

**BÛN dema niha**

| | | |
|---|---|---|
| Ez | dilxweş | im |
| Tu | | i |
| Ew | | e |
| Em<br>Hûn<br>Ew | | in |

**BÛN dema borî**

| | | |
|---|---|---|
| Ez | dilxweş | bûm |
| Tu | | bûy |
| Ew | | bû |
| Em<br>Hûn<br>Ew | | bûn |

Institut kurde de Paris

## *Hevokên neyînî*

**Dema niha**

| | | |
|---|---|---|
| Ez | ne dilxweş | im |
| Tu | | î |
| Ew | | e |
| Em<br>Hûn<br>Ew | | in |

**Dema borî**

| | | |
|---|---|---|
| Ez | dilxweş | nebûm |
| Tu | | nebûyî |
| Ew | | nebû |
| Em<br>Hûn<br>Ew | | nebûn |

## 8 D

### *1- Rojenivîska min* *28- Berfanbar 1997*



*Ez beyanî zû ji xew rabûm û min ser û çavên xwe şûştin. Paşî hingî min taştiya xwe xwar.*
*Cilên xwe wergirtin û ez çûm derve. Min rojnameyek kirî, li otobusê siwar bûm û çûme dibistanê. Di otobusê de min rojname xwend. Saet di neh û nîvan de ez gihîştim dibistanê û ji otobusê peya bûm. Hemû hevalên min di sinifê de amade bûn, ji ber ku me azmûna zimanê kurdî hebû. Azmûnê saet di deh û nîvan de dest pê kir. Mamoste ji bo bersivdana pirsan du saet dan me. Azmûn gelekî zor nebû. Ji bilî teksta xwendinê min hemû pirs bersîvandin. Der barê rojeka xwe de min paragrafek jî nivîsand. Paşî qedandina azmûnê em çûne çayxaneyê, me çay vexwar û em axivîn. Di dawiyê de herkes çû mala xwe.*

### *Van bêjeyan di nav tekstê de peyda bikin û binê wan xîç bikin.*

| | | | |
|---|---|---|---|
| rabûn | şûştin | xwarin | çûn |
| kirîn | xwendin | gihiştîn | hebûn |
| destpêkirin | bersîvdan | nivîsandîn | vexwarin |
| axaftin | | | |

Institut kurde de Paris

***Bersîva van pirsan bidin.***

1- Ew çima beyanî zû rabû?
2- Wî kengî taştiya xwe xwar?
3- Wî di otobusê de çi kir?
4- Ew kengî gihîşte dibistanê?
5-Azmûnê kengî dest pê kir?
7- Wan piştî azmûnê çi kir?
8- Çima hemû xwendekar di sinifê de amade bûn?
9- Ew li ku derê ji otobusê peya bû?
10- Berî siwarbûna otobusê wî çi kirî?

***2- Cînavkên xwedîtiyê***

Ez beyanî zû radibi**m** (dema niha)
Ez beyanî zû rabû**m** (dema borî)
Ez diç**im** dibistanê (dema niha)
Ez çû**m** dibistanê (dema borî)
Belê,
Ez rojnameyê dixwîn**im** (dema niha)
**Min** rojname xwend (dema borî)
Çima di dema borî de cînavk hate guherîn û bû "min"?

**RZ:** Di zimanê kurdî de heke lêker gerguhêz be ji bo demên borî cînavkên "min, te, wî, wê, me, we û wan" têne xebitandin.
Heke lêker negerguhêz be ji bo hemû deman cînavkên "ez, tu, ew, em, hûn, û ew" têne xebitandin.

Institut kurde de Paris

***Lêkerên gerguhêz:*** *xwarin, xwendin, dîtin, gotin, kirîn, xwestin û hwd.*

**Min** nan xwar. (xwarin)
**Min** rojname xwend. (xwendin)
**Min** xezalek dît (dîtin)

*Divê di lêkerên gerandî bireser de hebin. Heke bireser nebin tu wateya wê*

hevokê nîn e.

| | | |
|---|---|---|
| Min | nan | xwar. |
| Kirde | obje | lêker |

| | | |
|---|---|---|
| Min | rojname | xwend. |
| Kirde | obje | lêker. |

*Heke em bêjin "min xwend" hingî ew hevok kêm dimîne ji ber ku bireser "rojname" li gel nîne û ne kifş e jî ka kirde çi xwend.*

**Min** (du) rojname xwend**in**.
**Min** çar xezal dît**in**.

**Rêz:** *Heke bireser piranî be hingî lêker herwekî mastar tê nivîsandin. Xwarin, xwendin, dîtin û hwd.*

***Lêkerên negerguhêz:*** *Çûn, hatin, bezîn, xebitîn, westîn, betilîn, meşîn, ketin, girîn, kenîn û hwd.*

| | | |
|---|---|---|
| Ez çûm. | Ez | çûm. |
| Ez bezîm. | Kirde | lêker |
| Ez xebitîm. | Ez | kenîm |
| | Kirde | lêker |

*Lêkerên negerguhêz bê bireser wateya wan heye.*

**Ez xebitîm:** Wateya wê ew e ku ez neravestîm, min kar kir

Institut Kurde de Paris

## ***Lêkerên negerguhêz***

| | Kenîn | Girîn | Meşîn | Westîn | Bezîn |
|---|---|---|---|---|---|
| Ez | keniyam | giriyam | meşiyam | westiyam | beziyam |
| Tu | keniyayî | giriyayî | meşiyayî | westiyayî | beziyayî |
| Ew | keniya | giriya | meşiya | westiya | beziya |
| Em | keniyan | giriyan | meşiyan | westiyan | beziyan |
| Hûn | keniyan | giriyan | meşiyan | westiyan | beziyan |
| Ew | keniyan | giriyan | meşiyan | westiyan | beziyan |

***An jî***

| | Kenîn | Girîn | Meşîn | Westîn | Bezîn |
|---|---|---|---|---|---|
| Ez | kenîm | girîm | meşîm | westîm | bezîm |
| Tu | kenî | girî | meşî | westî | bezî |
| Ew | kenî | girî | meşî | westî | bezî |
| Em | kenîn | girîn | meşîn | westîn | bezîn |
| Hûn | kenîn | girîn | meşîn | westîn | bezîn |
| Ew | kenîn | girîn | meşîn | westîn | bezîn |

Institut Kurde de Paris

**RÊZ :** *Di zimanê Kurdî de ew lêkerên du kite û yên bi- în têne qedandin, dikarin du cûre bêne xebitandin di demên borî de. Her du cûre jî wekî hev rast in.*

## ***Lêkerên gerguhêz***

| | | Xwendin | | | Dîtin |
|---|---|---|---|---|---|
| Min | rojname | xwend | Min | Rizgîn | dît |
| Te | rojname | xwend | Te | Rizgîn | dît |
| Wî | rojname | xwend | Wî | Rizgîn | dît |
| Wê | rojname | xwend | Wê | Rizgîn | dît |
| Me | rojname | xwend | Me | Rizgîn | dît |
| We | rojname | xwend | We | Rizgîn | dît |
| Wan | rojname | xwend | Wan | Rizgîn | dît |

***Belê heke bireser pirjimar be hingî:***

| | | Xwendin | | | Dîtin |
|---|---|---|---|---|---|
| Min | du rojname | xwend**in** | Min | Rizgîn û Koçer | dît**in** |
| Te | du rojname | xwend**in** | Te | Rizgîn û Koçer | dît**in** |
| Wî | du rojname | xwend**in** | Wî | Rizgîn û Koçer | dît**in** |
| Wê | du rojname | xwend**in** | Wê | Rizgîn û Koçer | dît**in** |
| Me | du rojname | xwend**in** | Me | Rizgîn û Koçer | dît**in** |
| We | du rojname | xwend**in** | We | Rizgîn û Koçer | dît**in** |
| Wan | du rojname | xwend**in** | Wan | Rizgîn û Koçer | dît**in** |

**RÊZ:** *Heke bireser yekjimar be- in li master tê avêtin û lêker wisa tê nivîsîn, belê heke obje piranî be hingî- in li mastar nayê avêtin û mastar nayê*

Institut kurde de Paris

### *Guhertina Navan*

Wê rojname xwend (Şîlan)
Şîlanê rojname xwend
Wî rojname xwend (Rizgîn)
Rizgînî rojname xwend
Wan rojname xwend ( Karker)
Karker**an** rojname xwend
Me rojname xwend
Şîlanê û min rojname xwend
Wan rojname xwend
Şîlanê û Rizgînî rojname xwend

**RÊZ:** *Heke kirde nav be"ê" ji bo navên mê, "î" ji bo navên nêr û "an" ji bo navên piranî tê xebitandin. Herwekî Şîlanê, Rizgînî û Karker**an**.*

### 3- Cihên vala bi cînavkan, cînavkên xwedîtiyê, lêkerên gerguhêz û negerguhêz tijî bikin.

1- ............................çû bo dibistanê

2- ...........................du pirtûk xwendin

3- Siyabend li balafirê ............. ........û ..........Amedê

4- ................................beyanî beziya

5- Çima .............dilnexweş...........

6- ................dihu rojname nexwend

7- Heftiya çûyî ................gelek westiyan

8- ................negot tu xerabî

9- Ez pêr gelek nexweş.....................

10- Sala çûyî ................pir xebitîm

11- .......................li Deriyê Çiyê li otobusê ........... .... ..... û ber derê mala xwe............. bûn

12- Şeva çûyî ................... heta beyanê nenivîst

13- Min du nan.................

14- Beybûn ......................pênc zarok hene

15- Merwan ............ du name ..............

16- ....................payîzê gûz weşandin

17- Zivistana çûyî gelek sar ...........................

18- Par .............bîst salî ........... îsal ez bîst û yek salî ..............

19- ................. xaniyek li nav zeviyê da ava.............

20- ............ ......... saet çarê êvarî ...........gihiştin Mahabadê

Institut kurde de Paris

### 4- NIVÎSANDIN

Paragrafekê der barî sersala nû de binivîse.

Te beyanî heta dema nivîstinê çi kir?

## 5- Bêjeyên girîng ji bo bîranînê

*Navên demsalan:*

Bihar - Havîn - Payîz - Zivistan

*Navên heyvan:*

| | | | |
|---|---|---|---|
| Adar | Avrêl | Gulan | Pûşper |
| Tîrmeh | Gelawêj | Rezber | Kewçêr |
| Sermawez | Berfanbar | Rêbendan | Reşemî |

*Navên rengan:*

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Kesk | Şîn | Sor | Pembe | Qehweyî |
| Spî | Reş | Xakî | Binevşî | Zer |

| | | | |
|---|---|---|---|
| baran barîn | dilnexweş bûn | siwar bûn | amade bûn |
| berf barîn | zarokatî | peya bûn | dîtin |
| peyda bûn | aborî | şûştin | kenîn |
| dewlemend | asteng | xwarin / vexwarin | girîn |
| belengaz / xizan | gihîştin | xwendin | meşîn |
| dilxweş bûn | westîn | axiftin | bezîn |

Institut kurde de Paris

### Bi bêjeyên jorîn 10 hevokan çêbikin

1- ................................................ 6- ................................................

2- ................................................ 7- ................................................

3- ................................................ 8- ................................................

4- ................................................ 9- ................................................

5- ................................................ 10- ................................................

### *6- Bala xwe bidin tabloyên jêrîn û bi kar bînin.*

**BÛN**

Erênî (dema niha)

<table>
<tr><td>Ez</td><td rowspan="4">dewlemend</td><td>im.</td></tr>
<tr><td>Tu</td><td>î.</td></tr>
<tr><td>Ew<br>Ew</td><td>e.</td></tr>
<tr><td>Em<br>Hûn<br>Ew</td><td>in.</td></tr>
</table>

Neyînî (dema niha)

<table>
<tr><td>Ez</td><td rowspan="4">ne</td><td>dewlemendim.</td></tr>
<tr><td>Tu</td><td>dewlemendî.</td></tr>
<tr><td>Ew<br>Ew</td><td>dewlemende.</td></tr>
<tr><td>Em<br>Hûn<br>Ew</td><td>dewlemendin.</td></tr>
</table>

**BÛN**

Erênî (dema borî)

<table>
<tr><td>Ez</td><td rowspan="4">dewlemend</td><td>bûm.</td></tr>
<tr><td>Tu</td><td>bûyî.</td></tr>
<tr><td>Ew<br>Ew</td><td>bû.</td></tr>
<tr><td>Em<br>Hûn<br>Ew</td><td>bûn.</td></tr>
</table>

Neyînî (dema borî)

<table>
<tr><td>Ez</td><td rowspan="4">dewlemend</td><td>nebûm.</td></tr>
<tr><td>Tu</td><td>nebûyî.</td></tr>
<tr><td>Ew<br>Ew</td><td>nebû.</td></tr>
<tr><td>Em<br>Hûn<br>Ew</td><td>nebûn.</td></tr>
</table>

Institut kurde de Paris

### *7- Dema niha an jî dema borî bi kar bînin û hevokên jêrîn bi lêkera "bûn" kuta bikin.*

1- Îro Binefş nexweş ................ (bûn)
2- Dihu em li gund .....................(bûn)
3- Îro em li bajêr .......................(bûn)
4- Tu du roj berê li ku derê ...............(bûn)
5- Hûn karker ...........................?(bûn)
6- Bahuz dihu li malê ................(bûn)
7- Zelal û Lezgîn pêr li sûrkê ................(bûn)
8- Ez sala çûyî li Mehabadê .................(bûn)
9- Em roja yekşemê li dibastanê ...............(bûn)
10- Wê gavê hemû xwendekar di sinifê de ............ (bûn)
11- Par ez li Frenseyê ............... (bûn)

# UNÎTE 9

## 9 A - PORÊ WÎ GINGILÛK E.



Institut kurde de Paris

***1- Bêjeyên di nav çargoşeyê de li rex hejmaran binivîsin***

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| sukur | çav | difin (bêvil) | guh | ser |
| pirç | brû | lêv | cênîk | didan |
| enî | bijang | dev | çene | |

**_2- Kîjan kî ye?_**



1



2



3

☐ **Şermîn:** Porê wê dirêj û zer hilû ye. Çavên wê şîn in. Xalek li ser cênika wê heye.

☐ **Rewşen:** Porê wê pêldar û kurt e. Çavên wê kesk in.

☐ **Gulîzar:** Çavên wê reş û mezin in. Porê wê gingilûk e.

**_3- Bi alîkariya bêjeyên di nav çargoşeyê de hindek hevokan der barê xwe de binivîse._**

| | | | |
|---|---|---|---|
| dirêj | girûz | reş | qehweyî |
| hilû | kurt | şîn | mezin |
| xwer | zer | kesk | biçûk |

*Wîsa dest pê bike*: Ez 1.75 m dirêj im. Porê min ..........................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

**_4- Hindek hevokan jî der barê hewalek an ji xizmeke/î xwe de binivîse._**

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

Institut kurde de Paris

## 9 B - BERHEVANÎ Û SEREKAYÎ

### 1- Kî dirêjtir e?



Gulîşan
1.65 m dirêj
15 salî



Dilêr
1.75 m dirêj
17 salî



Zendîn
1.85 m dirêj
20 salî

Dilêr ji Gulîşanê dirêjtir e.

Zendîn dirêjtirîn e.

***an jî***

Zendîn ji hemûyan dirêjtir e.

Institut kurde de Paris

### 2- Kî ciwantir e? Kî pîrtir e?

Van hevokên jêrîn bi rengdêrên di nav kevanan de tijî bikin

1- Gulîşan ji Dilêrî ..................... e (ciwan)

2- Dilêr ji Zendînî ....................... e (ciwan)

3- Zendîn ....................... e (pîr)

4- Gulîşan ....................... (ciwan)

5- Gulîşan ji Dilêrî ................. e (kurt)

6- Zendîn ji hamûyan ...............e (bilind)

7- Dilêr ji Gulîşanê ...................e (bilind)

### 3- Berhevanî û serekayiyên rengdêrên jêrîn binivîsin

| Rengdêr | Berhavanî | Serekavî |
|---|---|---|
| bilind | bilindtir | bilindtirîn |
| dirêj | dirêjtir | dirêjtirîn |
| kurt | | pîrtirîn |
| pîr | | |
| ciwan | | |
| erzan | | |
| giranbiha | | |
| zirav | ziravtir | |
| qelew | | qelewtirîn |
| asan | | asantirîn |
| sext / zor | | |
| dilxweş | | |
| baş | | |
| xerab | | |
| zîrek | | |
| teral | | |
| kirêt | | |
| jêhatî | | |
| balkêş | | |
| hêdi | | |
| fêris | | |
| serfiraz | | |

### 4- Bi alîkariya rengdêran, berhevaniya bajarên Amedê û Enqereyê bikin.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| AMED | biçûk<br>germ<br>erzan<br>kevn<br>aram | ENQERE | mezin<br>nûjen<br>geremal<br>sar<br>giranbiha | *Mînak:* Amed ji Enqereyê biçûktir e. |

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................



Institut kurde de Paris

## *5- Hinek hevokên neyînî çêkin*

***Mînak:*** Çiyayê Agirî / Çiyayê Cûdî / bilind
Çiyayê Cûdî ji Çiyayê Agirî ne bilintir e.

1- Bajarê Amedê / bajarê Wanê / germ
2- Çemê Xabûrê / Çemê Misîsipî / dirêj
3- Fîl / ga / mezin
4- Şêr / se / xurt
5-Aştî /dijminatî / baş
6- Gola Wanê / Gola Ûrmiye / mezin
7- Dûrnivîs /kompîtur / giranbiha

## 9 C - WEKHEVÎ

### *1- Ez bi qasî te bilind im*

Şîlan

50 kg
20 salî
1.75 cm. bilind



Hîvda

50 kg
20 salî
1.75 cm. bilind



Institut kurde de Paris

Şîlan bi qasî Hîvdayê qelew e.
Derbarê Şîlanê û Hîvdayê de du hevokên din çêbikin.
1- ..............................................................................
2- ..............................................................................

***2- "Bi qasî" bi kar bînin û bi bêjeyên jêrîn hindek hevokan çêbikin.***

*Mînak:* Mehabat / Amed / mezin
Bajarê Mehabadê bi qasî bajarê Amedê ne mezin e

Entab /Amed / germ
Bajarê Entabê bi qasî bajarê Amedê germ e

1- Şêr / piling / xurt

..............................................

2- Şêr / gurg / xurt

..............................................

3- Kitik / kûsî / beza

..............................................

4- Mar / dûpişk / xeter

..............................................

5- Keçik / kurik /zîrek

..............................................

***3- Bersivên van pirsan binivîsin.***

***PIRS***

1- Li welatê te, bajarê mezintirîn kîjan e?

..................................................................

2- Li welatê te, gola mezintirîn kîjan e?

..................................................................

3- Li welatê te, çiyayê bilintirîn kîjan e?

..................................................................

4- Li Tirkiyeyê, bajarê ji hemûyan mezintir kîjan e?

..................................................................

5- Li dinyayê, çemê dirêjtirin kîjan e?

..................................................................

6- Li welatê te, nivîskar û stranbêjê/a bi nav dengtirîn kîjan in?

..................................................................

7- Li dinyayê cihê sartirîn ku der e?

..................................................................

Institut kurde de Paris

## *4- Bi bêjeyên jêrîn hevokan çêbikin*

***Mînak:*** Xwendin / baş / gelek / e

Xwendin gelek baş e.

1- Serfiraz/ dixwazim / bibim/ ez

..........................................................

2- Ciwan / Şîlan / e / gelek

..........................................................

3- Mêrekî/ jêhatî / Reşo / ye

..........................................................

4- Min / bavê / ne / gelekî / dirêj / e

..........................................................

5- Qelew / ne / î / gelek / gelek / tu

..........................................................

6- Cîranê / in / xerab / min / ne

..........................................................

7- Keça / zîrektirîn / di / zanîngehê / de / Cembelî / e

..........................................................

8- Hez / xwendekarên / ji / ez / nakim / teral

..........................................................

9- Wê / ziravtir / bejna / min / ji / bejna / e

..........................................................

10- Hûn / in / dewlemend / ne/me / bi qasî

..........................................................

Institut kurde de Paris

## 9 D - XWENDIN

### *1- a) Vê teksta xwendinê bixwîne û binê rengdêran xîç bike.*

*Hînî zimanê xwe bibin.*



Kuro eyb e, şerm e! An hînî zimanê xwe bibin an nebêjin em Kurd in. Bê ziman Kurdîtî ji we re ne tu rûmet e. Ji me re rûreşiyeke giran e.

Pesn û şabaş û hezar pîroz ji wan re ku hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bûne û bi vî awayî mifta heyîna xwe xistine berîka xwe û ji bin bandora miletên biyanî der ketine.

Heyf û xebînet û hezar mixabin, nemaze ji wan re ku bi zimanên din dizanin bixwînin û binivîsinin, lê hêj alfabeya xwe nas nakin.

Lê ji bo hînbûnê çi caran wext ne dereng e û wextê hînbûnê li çi kesî nabore.

Yên ku bi alfabeya zimanê xwe nizanin, lê bi zimanên din dizanin, divêt bizanin ku ev alfabe dê rojekê ji wan bête pirsîn. Lê kes nizane, heke ew roj dûr e an jî nêzik e.

Hingî bibêjin jî em dê fêr bibin, li wan dê bête vegerandin: Me hêvî hebû em ji te mamosteyekî peyda bikin ne şagirtekî.

Belê bi tenê hînbûn ne besî me ye. Divêt em hîn bikin jî. Her kurdê ku xwendin û nivîsandinê dizane divêt yên ku nizanin fêr bikin. Ji kurdên xwenda re divêt heke li ber destê wan, kurdên nezan nebin, li wan bigerin, wan peyda û hîn bikin.

Min bi xwe ceribandiye, kurdekî nezan, li gora şehrazahiya xwe, di wextekî gelek kurt de, ji pênc heta sih rojan hînî alfabeya xwe dibe.

***Celadet Elî Bedirxan***
*Kovara Hawarê, Hejmar 27, 15 Avrêl 1941.*

### *b) Berhevanî û serekayî ya rengdêrên jêrîn bikin*

| *Rengdêr* | *Berhevanî* | *Serekayî* |
|---|---|---|
| şerm | | |
| rûmet | | |
| dûr | | |
| nezik | | |

***c) Hevwateyên (sînonîm) bêjeyên jêrîn di nav tekstê de peyda bike û li rex binivîse***

1- Şerm (rêzika duyê) ....................................
2- Xasma (rêzika pêncê) ....................................
3- Fêrbûn (rêzika heftê) ....................................
4- Gotin (rêzika dehê) ....................................
5- Têr (rêzika donzdehê) ....................................

***d) Pirsan bersîv bidin.***

1- Ew tekst di derbarê çi de ye?
.....................................................................
2- Nivîskar derbarê wan ên ku kurdî dizanin de çi dibêje?
.....................................................................
3- Nivîskar derbarê wan ên ku kurdî nizanin de çi dibêje?
.....................................................................
4- Divêt kurdên xwenda çi bikin?
.....................................................................
5- Celadet Elî Bedirxan kî ye?
.....................................................................

***2- Berevajiya rengdêrên jêrîn binivîsin***

| | | | |
|---|---|---|---|
| zû | X ................................ | erzan | X ................................ |
| teral | X ................................ | pîr | X ................................ |
| lawaz | X ................................ | asan | X ................................ |
| mixabin | X ................................ | dilxweş | X ................................ |
| şehraza | X ................................ | zana | X ................................ |
| rûmet | X ................................ | dûr | X ................................ |
| kirêt | X ................................ | balkêş | X ................................ |
| xerab | X ................................ | giran | X ................................ |
| kurt | X ................................ | bilind | X ................................ |

Institut kurde de Paris

## 3- Van hevokan bi rengdêran kuta bikin.

*Heke pêwist be berhevanî û serekayiya rengdêran bixebitînin*

1- Cembelî gelek ........... e. Di sinifê de ew yekemîn xwendekar e.
2- .................. ku tu ji sinifa xwe derneketî.
3- Axaftina serokê komeleya mafê mirovan gelek .............
4- Azadî û serxwebûnê ............ tu tişt nîne.
5- Xwendekarên ............. tu caran ......... nabin.
6- Hesin ji pembûyê ...........
7- Li dinyayê çiyayê ...... ............. Everest e.
8- Di sinifê de .......... xwendekar Şîlan e. Hemû dersên wê baş in.
9- Zivistan ji payîzê .......... e.
10- Roj ji dinyayê .................. e.

## 4- NIVÎSANDIN

*Berhevanî û bereksiya bajarê xwe li gel bajarekî din bikin.*
*Wîsa dest pê bike:*

Ez li bajarê Kerkûkê dijîm. Ez dixwazim berhavanî û bereksiya bajarê xwe li gel bajarê Enqereyê bikim.........................................................................................
..........................................................................................................................
..........................................................................................................................
..........................................................................................................................
..........................................................................................................................
..........................................................................................................................
..........................................................................................................................

Institut kurde de Paris

## 5- Bêjeyên giring ji bo bîranînê

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| gingiluk | simbêl | balkêş | hînbûn | rengdêr |
| pêldar | dev | serfiraz | fêrbûn | berhevanî |
| hilû | didan | kevn | mezin | serekayî |
| sikur | çav | nû | biçûk | wekhevî |
| çav | difin | erzan | germ | |
| difin | çene | biha | asan | |
| guh | kurt | baş | sext | |
| ser | dirêj | xerab | zor | |
| pirç | bilind | mixabin | zîrek | |
| birû | ciwan | rûmet | teral | |

## *6- BERHEVANÎ Û SEREKAYÎ*

*Forma rengdêran binivîsin*

| Rengdêr | Berhevanî -tir | Serekayî -tirîn |
|---|---|---|
| wekoki: baş | baştir | baştirîn |
| bilind | ................. | ................. |
| ................. | ................. | ................. |
| xizan | ................. | ................. |
| ................. | ................. | qelewtirîn |
| ................. | dewlemendtir | ................. |

Zerdeşt bîst salî ye
Mehsîma hijdeh salî ye
Baran bîst û pênç salî ye
Zerdeşt ji Mehsîmayê pîrtir e
Baran pîrtirîn e
Mehsîma ji Zerdeşt ne pîrtir e
Baran ji Mehsîmayê ne cîwantir e

### *WEKHEVÎ*

### *HINDÎ*

Rengîn 1.75 cm bilind e
Çelo 1.75 cm bilind e
Bahuz 1.65 cm bilind e
Rengîn bi qasî Çelo bilind e
Çelo bi qasî Rengînê bilind e
Bahuz bi qasî Çelo û Rengînê bilind nîne.
Rengîn bi qasî çelo dirêj e.
Çelo bi qasî Rengînê dirêj e.

## *7- Berhevanî, serekayî û wekheviya xwendekaran bikin.*

Di ezmûna kurdî de:
Yekbûnê 90 not wergirt.
Rojbînê 95 not wergirt.
Bahozî 80 not wergirt.
Çelo 90 not wergirt.

Kî zîrektir e? Kî ne zîrektir e û kî bi qasî hevdu zîrek in? Binivîsin.

............................................................................................................

............................................................................................................

............................................................................................................

Institut kurde de Paris

# UNÎTE 10

## 10 A - PEYTKIRIN

### *1- Ew pirtûka kî ye* / *Ew pirtûkên kî ne?*

| YEKJIMAR | PIRJIMAR |
|---|---|
| Ew pirtûka min e. | Ew pirtûkên min in. |
| Ew pirtûka te ye. | Ew pirtûkên te ne. |
| Ew pirtûka wê ye. | Ew pirtûkên wê ne. |
| Ew pirtûka wî ye. | Ew pirtûkên wî ne. |
| Ew pirtûka me ye. | Ew pirtûkên me ne. |
| Ew pirtûka we ye. | Ew pirtûkên we ne. |
| Ew pirtûka wan e. | Ew pirtûkên wan in. |
| Ew pirtûka Gulbarînê ye. | Ew pirtûkên Gulbarînê ne. |
| Ew pirtûka Bedranî ye. | Ew pirtûkên Bedranî ne. |
| Ew pirtûka Gulbarînê û Bedranî ye. | |

Institut kurde de Paris

| **Navên nêr (yekjimar)** | **Navên mê (yekjimar)** | **Navên nêr û mê (pirjimar)** | |
|---|---|---|---|
| Kurê min | Keça min | Kurên min | Biraziyên min |
| Xaniyê wê (Şîlanê) | Biraziya min | Keçên min | Xwarziyên min |
| Welatê me | Xwarziya min | Xaniyên wê | Birayên min |
| Gundê wan | Mala wan | Welatên biyanî | Malên wan |
| Biraziyê min | Meta min | Gundên wan | Metên min |
| Xwarziyê min | Xaleta min | Dayîkên me | Xaletên min |
| Birayê te | Dayîka te | Dotmamên te | |
| Pismamê min | Dotmama min | | |

## *Rêz çi ye?*

- Navên nêr û yekjimar tîpa dawiyê dengdêr be çawa, dengdar be çawa tê nivîsandin?
- Navên mê û yekanî tîpa dawiyê dengdêr be çawa, dengdar be çawa tê nivîsandin?
- Heke navên nêr û mê piranî bin û tîpên dawiyê dengdêr û dengdar bin çawa tê nivîsandin?

**Navên nêr û yekjimar ( ê û yê ye)**

Gund → Gundê me (Tîpa dawiyê dengdar)
Xanî → Xaniyê me (Tîpa dawiyê dengdêr)

**Navên mê û yekjimar (a û ya ye)**

Evîn → Evîna min (Tîpa dawiyê dengdar)
Aborî → Aboriya me (Tîpa dawiyê dengdêr)

**Navên nêr û mê pirjimar ( ên û yên e)**

Gund → Gundên me ( Tîpa dawiyê dengdar)
Xanî → Xaniyên me (Tîpa dawiyê dengdêr)
Evîn → Evînên me (Tîpa dawiyê dengdar)
Aborî → Aboriyên me (Tîpa dawiyê dengdêr)

Institut kurde de Paris

## *2- Nêr an jî mê?*

***Mînak:*** Xal Xalê min

| | | |
|---|---|---|
| Bab ...................... | Çiya ...................... | Ser ...................... |
| Çav ...................... | Guh ...................... | Pê ...................... |
| Dev ...................... | Didan ...................... | Ling ...................... |
| Mil ...................... | Ode ...................... | Dar ...................... |
| Kovar ...................... | Rojname ...................... | Dibistan ...................... |
| Zanîngeh ...................... | Zevî ...................... | Por ...................... |
| Kiras ...................... | Şelwar ...................... | Derî ...................... |
| Kurtek ...................... | | |

***3- Niha li wêneyan binêrin, pirsan bikin û bersivan bidin. Navên nêr û mê cînavkên xwedîtiyê, yekjimarî û pirjimariya navan ji bîr nekin.***

***Mînak:*** Ew keça kê ye?

Ew keça Rîmdarî ye. ( Rîmdar )



1- ........................................... ? ( Kur )

........................................... ( Şîlan )



2- ........................................... ? ( Keçik û kurik )

........................................... ( Rizgîn )

3- ........................................... ? ( Sê hesp )

........................................... (Xalit )



4- ...........................................? ( Deh pênûs )

...........................................



Institut kurde de Paris

## *4- Hevokên jêrîn xelet in, wan rast bikin.*

A- Şîlan biraziyê min e.

*Şîlan birazaya min e.*

B- Zorava gunda Brûskê ye.

..................................................

C- Navê pismama te çî ye?

..................................................

D- Her çar xaletên min li gund dijî.

..................................................

E- Çiyaya welatê min gelek ciwan in.

..................................................

F- Ez li zaningeh bijîjkî dixwînim

..................................................

H- Xwişkê min ne xwendekar in.

..................................................

I- Hîrmîên gundê me gelek xweş in.

..................................................

J- Bajarê me pir xweş e.

..................................................

K- Zerdeşt besteniyê xweş çê dikim.

..................................................

L- Navên metên min Husna û Asiya ye

..................................................

M- Ma dotmamê te mamosta ye

..................................................

N- Hemû hevala min zîrek in.

..................................................

O- Te hemû rojnameyê îro xwendin?

..................................................

P- Te rojnameyê Azadiya Welat xwend?

..................................................

Q- Elî xwarziya min e.

..................................................

R- Her çar keçê we mêr kirine.

..................................................

S- Hemû biraên wê jin anîne.

..................................................

T- Te jinê anîne.

..................................................

U- Dayîkê te û bavê te çawa nin?

..................................................

V- Xaniya min biçûk e, belê mala min ciwan e.

..................................................

Institut kurde de Paris

## 10 B

### *1- Pirsên van bersivan binivîse.*

1- ........................................................

Ez beyanî zû radibim.

2- ........................................................

Ew bi şev rojnameyê dixwîne û dersa xwe dike.

3- ........................................................

Gulbarîn niha serê xwe dişo.

4- ........................................................

Dawiya heftiyê em diçin kursa zimanê kurdî.

5- ........................................................

Ez li Enqereyê dijîm.

6- ........................................................

Min du xwîşk û du bira hene.

7- ........................................................

Sorgul xwendekar e.

8- ........................................................

Na, ez hez ji çayê nakim.

9- ........................................................

Beyanî ez diçim zanîngehê.

10- ........................................................

Ez saet di donzdehan de firavîn dixwim.

Institut kurde de Paris

### *2- Bi bêjeyên jêrîn hevokan çêkin. Divê hûn forma lêkeran biguhêrin.*

***Mînak:*** Hez / kirin / ji / golanê / Sefkan
Sefkan hez ji golanê dike.

1- Radibin /Hêlîn û Yezdînşêr / dawiya / dereng / heftiyê

..........................................................................................

2- Bi şev / ez / zû / nivîstim

..........................................................................................

3- Xal / Berîvan / ê / endezyar / ê / e

..........................................................................................

4- Niha / hevokan / em / kirin / çê

..........................................................................................

5- Tu /çend / dixebitî / saet / rojê

..........................................................................................

6- Berçem / Şîlan / û / çûne / şanoyê.

..........................................................................................

7- Xwe / niha serê / şuştin / ê / ez

..........................................................................................

8- Xwend / wan / kovarek / niha

..........................................................................................

9- Dibezin / beyanî / caran hemû / em

..........................................................................................

10- Sorgul / Gulazer / û / tenîs / roj / her / leyîstin

..........................................................................................

### *3- Van hevokan neyînî bikin*

***Mînak:*** Ez li malê firavînê dixwim.
Ez li malê firavînê naxwim.

1- Em roja yekşemê diçin Dihokê.

.......................................................

2- Tu çima werzişê dikî?

.......................................................

3- Ez dixwazim binivim.

.......................................................

4- Divê hûn gelek bixebitin.

.......................................................

5- Matematîk gelek asan e.

.......................................................

Institut kurde de Paris

## 4- Pirsên bersivan binivîsin.

***Mînak:*** Ev ferheng bi çendê ye?

Ev bi çar milyonan e.

1- ........................................?

Kîloya şembelotan bi sê sed hezarî ye.

2- ..........................................?

Cotek pêlav bi donzdeh milyonan e.

3- ..........................................?

Na, ez nikarim piyanoyê lê bidim.

4- ..........................................?

Zîlan dikare bi frensî biaxive.

5- Ma ..................................?

Belê, ew dikarin avjenî bikin.

Institut kurde de Paris

## 10 C

### *1- Bi bêjeyên jêrîn hevokan çêke*

1- karî / tu / bi / nivîsî /kurdî

..................................................................

2- Zelal / sê / biaxive / zimanan / dikare

..................................................................

3- Beybûn / û / Şêrîn / xebitandin / kompîtur

..................................................................

4- Em / bibezin / xweş / dikarin

..................................................................

5- Biajom / ez / erebeyê / dikarim

..................................................................

6- Xwestin / wan / bibin / cotkar

..................................................................

7- Xwest / me / bibin / bindest / ne

..................................................................

Institut kurde de Paris

### *2- Binê bêjeyên cuda xêz bike.*

***Mînak:*** dayîk bav bira <u>xal</u> xwîşk

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| 1- | bihar | gulan | payîz | havîn | zivistan |
| 2- | berfanbar | avrêl | şemî | sermawez | pûşper |
| 3- | roj | sor | zer | reş | binevşî |
| 4- | rêl | zevî | rûbar | çiya | serfiraz |
| 5- | nivistin | rabûn | xwarin | zîrek | nivîsandin |
| 6- | çav | dev | mil | difin | ser |
| 7- | tiral | giran | erzan | xwendekar | ciwan |
| 8- | azadî | serxwebûn | mirovatî | xwendin | aştî |

### 3- Lêkera "bûn"ê bi kar bînin û hevokan çêkin

***Mînak:*** Ez niha li dibistanê me

Heftiya çûyî, ez li dibistanê bûm.

1- Zendîn niha li dibistanê ye

Dihu ......................................

2- Hûn îsal li Enqereyê ne.

Hûn par ......................................

3- Îro gelek germ e.

Dihu ............................................

4- Jina Xemgîn nexweş e.

..................................................

5- Em îro gelek westiyane.

..................................................

6- Tu îro pir dilxweş î.

..................................................

### 4- Hevokên jêrîn biguhêrin dema bihurî

***Mînak:*** Ez niha diçim dibistanê

Ez dihu çûm dibistanê

Ez niha firavînê dixwim

Min firavîn xwar

1- Ez dibezim

....................................

2- Xelîl pirtûkê dixwîne

....................................

3- Ew her roj rojnameyê dikire

Wê ....................................

4- Em alîkariya hevalên xwe dikin

..............................................

5- Ew avê dixwazin

..................................................

6- Şîlan cilê xwe dişo

..................................................

7- Ez niha ji hevalê xwe re nameye dinivîsim

............................................................

8- Rizgîn pir dixebite

..................................................

Institut kurde de Paris

### *5- Hevokên xelet rast bikin.*

***Mînak:*** Ez av vexwar.
Min av vexwar.

1- Wî rojname dixwîne

.....................................

2- Wê xwarin dixwe

.........................................

3- Me diçin mala xwe

............................................

4- Tu avjenî kir.

...........................................

5- Min birsî me

.............................................

6- Me dixebitin

.................................................

7- Şilan rojname xwend

.........................................

8- Yezdan pirek ava kir

..........................................

Institut kurde de Paris

## 10 D

### *Teksta jêrîn bixwînin û pirsan bibersivînin*

# *ŞÊR Û RÛVÎ*

*Şêrek li daristanekê li binê siya darekê vezeliyabû. Dît ku rûviyek di nêzîkî wî re derbas dibe û şêr ji rûvî pirsî:*

*- Wa rûvî tu li van dera li çi digerî?*

*Rûvî got:*

*- Ya şêr ez ji xwe re li tiştekî xwarinê digerim. Ez gelek birçî bûme. Ji birçîna êdî ez pêşiya xwe nabînim.*

*Li ser van gotinên rûvî dilê şêr gelekî bi rewşa wî şewitî. Şêr ji rûvî re got:*

*- Heger tu dev ji fenên xwe berdî ezê te bînime cem xwe û heta tu sax bî ezê te bi dûvê pezan xwedî bikim.*

*Rovî got:*

*- Ya şêr heger tu qenciyeke wiha bi min bikî heta ez sax bim ezê bibime xulamê te û tu caran ez ji gotinên te dernakevim.*

*Piştî van gotinên rûvî şêr rabû ser xwe ji rûvî re got:*

*- Dê bimeşe bikeve pey min.*

*Şêr û rûvî bi hev û din re meşiyan çûn nêzîkî keriyek pez sekinîn. Şêr ji rûvî re got:*

*- Rûvî ji bo ku ez germ bibim, ezê niha baz bidim. Heta ku çavên min sor bibin. Dema çavên min sor bûn tu ji min re bibêje.*

*Rûvî got:*

*- Belê ez xulam min zanî.*



*Şêr baz da çû serê kaş û heta binê kaş hata ku çavên wî sor bûn.*

*Rûvî got:*

*- Ya şêr çavên te wekî du pelên agir sor bûne.*

*Şêr sekinî berê xwe da keriya pez û berê xwe da pez çû kete nav pez de û pezek girt. Şivan û kûçikên ber pez ji tirsa şêr newêrubûn dengên xwe bikin. Şêr pezê girtî di cih de kuşt û bi xwe re anî û hate cem rûvî. Şêr û rûvî bi hev û din re meşiyan çûn şikefta şêr. Şêr dûvê pez jêkir da rûvî û kelax jî bixwe xwar.*

*Demeke dirêj rûvî li cem şêr ma. Rûvî qelew bû û jiyana wî gelek xweş derbas dibû, ew rojên birçî mayî ji bîra wî çûbûn. Lê fen, bêbextî û derew ji dilê wî xilas nebûbûn.*

*Rûvî rojekê ji xwe re got:*

*- Pêwîst e ez hewanan bînim serê şêr û ez xwe bikime axayê vî cihî. Ez jî dikarim karê şêr bikim. Çima ezê xulametiya wî bikim? Rûvî ji bo bêbextiyekê li şêr bike temamên fen û derewên xwe anîne ber çavên xwe.*

*Rojekê şêr û rûvî di şikeftê de ji xwe re dipeyîvîn. Rûvî ji şêr re got:*

*- Ya şêr, heger tu destûra min bidî ezê pirsekê ji te bikim.*

*Şêr got:*

Institut kurde de Paris

*- Ka bibêje pirsa te çî ye?*

*Rûvî got:*

*- Ya şêr îro mişkekê ji min pirsî û got: "Gelo ma tu zanî şêr bi çi têne girêdan êdî nekaribin xwe vekin". Min got na ez nizanim. Mişk bi min keniya û got, "ez zanim ma çawa tu nizanî, ma tu ne xulamê şêr î? Ya şêr ez gelek bi wan gotinên mişkî qeherim û li ber xwe ketim. Ez dixwazim tu ji min re bibêjî ka hûn bi çi têne girêdan?*

*-Şêr bi van gotinên rûvî hate xapandin û ji rûvî re got:*

*- Em bi mûyê teriya xwe tên girêdan.*

*Rûvî got: Çawa?*

*Şêr got:*

*- Dema mûyên teriya me bêne jêkirin û bi her du tiliyên destên me ve bêne girêdan, êdî em tu caran nikarin xwe vekin, lê wan gotinan ji kesê re nebêje.*

*Rûvî got:*

*- Ya şêr ezê çawa bibêjim ma ez dîn im.*

*Şeveke zivistanê şêr ketibû xeweke giran. Lê rûvî şiyar bû aqilê wî li ser fen û bêbextiyan bû ji ber wan fikrên xwe yên xirab nedinivîst.*

*Rûvî rabû ser xwe hate li ser şêr temaşe kir dît ku şêr ketiye xeweke giran, rûvî bi dilekî tirs hêdî hêdî ji teraya şêr di mû zû jêkirin û bi herdu tiliyên destê şêr ve girêda. Rûvî bi bazdanê ji şekeftê derket. Şêr di wê rewşê de hişt û çû.*

*Beyanî rûvî di nav daristanekî de digeriya piştî demekî du rûvî dîtin û ji wan re got:*

*- Heger hûn bibine xulamê min heta hûn sax bin ezê we bi dûvê pezan xwedî bikim.*

*Rûviyekî pirsî:*

*- Dûvê pezan tu dê ji ku bînî.*

*Rûvî got:*

*- Heger hûn qebûl bikin ezê ji we re bibêjim.*

*Wan jî qebûlkir. Giş bi hev re çûn nêzîkî keriyek pez sekinîn.*

*Rûvî got:*

*- Ezê niha bazdim, ji bo ku ez germ bibim û çavên min sor bibin.*

*Dema we dît çavên min sor bûn hûn ji min re bibêjin.*

*Rûvî bazda çû serê kaş û hate binê kaş. Ji hevalên xwe pirsî, "gelo ma hê çavên min sor nebûne? hevalên wî gotin, "na"*

*Rûvî dîsa dest bi bazdanê kir. Hevalên wî dizanin ku tu caran çavên rûviya sor nabin. Hevalên wî ji hev û din re gotin:*

*- Wê ev bibehice. Emê jê re bibêjin çavên te sor bûne. Gelo ka çi dike.*

*Rûvî hate bin kaş hevalên wî jê re gotin:*

*- Ya rûvî çavên te gelek sor bûne.*

*Rûviyê me jî wekî şêrekî bazda û çû ber keriya pêz û xwe avête pezekê. Pez tirsiya û bazda Şivanê ber pez rabû ser xwe dîtin ku rûviyek ketiye nav pez. Şivan qîr kire kuçikan û got "bigire bigire."*

*Kuçikan di cih de rûvî girtin û ji hev kişkişandin. Şivan jî hatin bi gopalên xwe ketin ser laşê rûvî. Rûvî di bin derbê gopalên şivanan de û di devê kuçikan de kire "hewar hewar" hetanî mir. Pêşiya bimire bidengekî bilind digot:*

*- Bila her kes bizane ku tu caran rûvî nabine şêr.*

*Şêr di şikeftê de hê jî girêdayî bû. Ji birçîbûnê û ji qehrê rûvî gelek bêxêr bibû. Belê tiştek jê nedihat. Rojekê mişkek ji quleke şikeftê derket û şêr dît. Pêşî mişk gelekî tirsiya lê dema dît ku şêr girêdayî ye êdî netirsiya. Dilê mişkê gelek bi rewşa şêr sot. Mişk hat bi diranê xwe hêdî hêdî mûyên bi destên şêr ve girêdayî qetand û destên şêr vekir.*

*Şêr rabû ser xwe hêdî hêdî ji şikeftê derket û ev gotine gotin:*

*- Ehd be ser min ew welatê ku girêdana şêran bi destên rûviyan be û berdana wan jî bi destên mişkan be ez êdî nemînim di wî welatî de.*

Institut kurde de Paris

## 1- Pirsên jêrîn bibersivînin. Heke hevok rast bin (R), heke xelet bin (x) li rex hevokan binivîsin.

*Wekok:*
Rûviyek li binê siya darekê razabû. .......

1- Şêr gelek birçî bû .......
2- şêr û rûvî peymanek çêkir .......
3- Rûvî ji şêr re got: ezê te bi dûvê pezan xwedî bikim. .......
4- Şêr bezî û rûvî ji wî re got "çavên te sor bûne".......
5- Şêr dû pez girtin .......
6- Rûvî kelaxê pezî xwar .......
7- Şêr û rûvî çûn şikefta rûvî .......
8- Mişk xulamê şêrî ye .......
9- Mişkî rûvî girêda .......
10- Kuçikan şêr girt .......
11- Mişkî şêr berda .......
12- Dawiyê rûvî meziniya şêrî qebûl kir .......
13- Şivanan alîkariya rûvî kir .......
14- Rûvî bezî û çavên wî sor bûn. .......
15- Rûvî bêbextî bi şêr kir. .......

Institut kurde de Paris

## 2- Duduve bixebitin û diyalogekê di navbenda <u>şêrê</u>, <u>rûvî</u> û <u>mişkî</u> de binivîsin. Wisa dest pê bikin

Şêr; Roj baş rûvî. Tû çawanî?
Rûvî: ..............................................................................................
Şêr : ..............................................................................................
Rûvî: ..............................................................................................
Şêr : ..............................................................................................
Rûvî: ..............................................................................................
Mişk: ..............................................................................................
Şêr : ..............................................................................................
Mişk: ..............................................................................................
Şêr : ..............................................................................................

# UNÎTE 11

## 11 A - TU DÊ SIBEHÊ ÇI BIKÎ?

G. 30

### *1- Li diyaloga jêrîn guhdarî bike û bixwîne.*



*Gulîzer:* Şev baş Binevş. Tu çawa yî?
*Binevş:* Spas Gulîzer. Ez baş im. Tu çawa yî?
*Gulîzer:* Ez jî baş im. Sibehê, Rûken, Serdar, Jêhat, ez û hindek hevalên din dê biçin şanoyê. Tu dixwazî bi me re werî?
*Binevş:* Ez dixwazim, belê saet çendê?
*Gulîzer:* Paşî nîvro, saet di du û nîvan de.
*Binevş:* Ez nikarim digel we bibim. Ji ber ku paşî nîvro ez dê biçim dibistanê. Ma em nikarin bi şev biçin?
*Gulîzer:* Bi şev jî dibe. Ez dê ji hevalan bipirsim û paşî ez dê te agahdar bikim. Bi rastî, hemû heval dixwazin te bibînin.
*Binevş:* Ez jî dixwazim wan bibînim.
*Gulîzer:* De baş e. Ez dê ji bo te telefon bikim.
*Binevş:* Ez dê li hêviya telefona te bim. Serçavan.
*Gulîzer:* Serçavan.

### *2- Niha didu didu bixebitin û pratîka diyaloga jorîn çêkin.*

### *3- Bersiva pirsên jêrîn bide.*

1- Sibehê Gulîzar û hevalên wê dê çi bikin?

.................................................................................................

2- Ew dê kengê biçin şanoyê?

.................................................................................................

3- Çima Binevş nikare beşdarî hevalên xwe bibe?

.................................................................................................

4- Kî dixwaze kê bibîne?

.................................................................................................

5- Di dawiyê de Gulîzar û Binevşê çi biryar dan?

.................................................................................................

Institut kurde de Paris

### *4- Tu dê sibehê çi bikî? Bernameya xwe ya sibehê binivîse û paşê ji bo hevalê xwe bixwîne.*

***Mînak:*** Ez dê sibehê saet di heft û nîvan de rabim.

Ez dê ..........................................................................................................................

.......................................................................................................................................

.......................................................................................................................................

.......................................................................................................................................

.......................................................................................................................................

.......................................................................................................................................

.......................................................................................................................................

.......................................................................................................................................

.......................................................................................................................................

.......................................................................................................................................

.......................................................................................................................................

.......................................................................................................................................

### *5- Niha ji hevalê/a xwe bipirse û zanibe ku bernameya wî / wê çi ye.*

## 11 B

### *1- Teksta jêrîn bixwîne, bersiva pirsan bide û hevokên dema pêşî xîç bike.*



Gulbarîn bijîşk e. Ew sih û du salî ye. Divê ew pir bixebite ji ber ku tu bijîşkê din li wî bajarî nîne û tenduristiya bajêr jî gelek xerab e. Ew her roj sibehê zû radibe, diçe kar û heta derengiya şevê dixebite.

Sibehê dîsa Gulbarîn dê zû rabe û biçe nexweşxaneyê. Ew dê saet di heşt û nîvan de dest bi kar bike û heta saet donzdehan bixebite. Paşî ew dê saet di donzdehan de biçe, firavîn bixwe û dê bizivire ser karê xwe. Gulbarîn dibêje "ez pir dixebitim, belê tu gazina min nîne. Ez ji bo nexweşên zarok, pîr, jin û mêr pewîst im".

Ew rojê nêzîkî pêncih nexweşan muayene dike û derman dike. Ne tenê nexweşên bajêr, belê nexweşên gundên derdora bajêr jî diçin nik Gulbarînê da ku derdê xwe derman bikin.

### *PIRS*

1. Gulbarîn çi karî dike?

   ....................................................

2. Çima divê ew pir bixebite?

   ....................................................

3. Ew dê sibehê kengî biçe nexweşxaneyê?

   ....................................................

4- Ew dê heta kengî bixebite?

   ....................................................

5- Kî diçine cem Gulbarînê da ku derdê xwe derman bikin?

   ....................................................

### *2- Didu didu bixebitin. Tu û hevalê/a xwe vê havînê dê biçin betlanê. Hûn dê çi bikin, lîsteya xwe çêbikin.*

*Mînak:* Em dê bi otobusê biçin Amedê.

..............................................

..............................................

### 3- Fala te kîjan e? Bixwîne û paşî ji bo hevalê xwe bibêje.

**Beran (Adar 21- Avrêl 20)**



Di jiyana te de îro rojeke pir girîng e. Divê tu hinek biryarên bingehîn bigrî. Netirse, ew biryar dê bibin bingehê jiyana te û dê jiyane te biguherînin. Tu dê serfiraz bibî.

**Ganer (Avrêl 21 Gulan 21)**



Tu dê biçî seredana hevalekî xwe yê gelekî hêja. Pir nûçeyên baş tu dê bibihîzî. Dibe ku tu hevalekî/e nû binasî.

**Cêwî (Gulan 22- Pûşper 21)**



Hefteya ku tê tu dê biçî rêyeke nêzîk. Hinek nexweşî dê çêbin belê ew nexweşî dê zû bibuhurin. Ji hevalên xwe re telefon bike ew dê bimînin di xema te de.

**Kêvjal (Pûşper 22- Tîrmeh 22)**



Tu dê hindek diravan bi dest bixî. Divê tu wan diravan bi hişyarî serf bikî. Rojên reş gelek in, divê tu wan tu caran ji bîr nekî.

**Şêr (Tirmeh 23-Gelawêj)**



Tu dê hindek diravan bivergiri. Divê tu wan diravan bi hişyarî serf biki. Rojên reş gelek in, divê tu wan çi caran ji bîr nekî.

**Şehrîwar (Gelawêj 24- Rezber 23)**



Serfirazî û serkeftin ji bo te gelek nêzik in, belê divê tu pir bixebitî. Hevalên li derdora te gelek hez ji te dikin.

**Mêzîn (Rezber 24- Kewçêr 23)**



Hevalekî te yê kevn dê bê seredana te. Tu dê bi hatina wî gelek kêfxweş bibî. Amedekar bibe. Mizgîniyek jî heye.

**Dûpişk (24 Kewçêr-22 Sermawez)**



Her gav bêoxiriyek bi we re digere. Gava hûn bixwazin, dikarin vê bêoxiriyê li ser xwe rakin. Lê dibe di nêzîk de xeberek baş ji we re bê, ecêbmayî nemînin.

**Kevan (Sermawez 23- Berfanbar 21)**



Rojên nexweş êdî qediyan. Tu dê beşdarî civînekê bibî û gelek tiştên xweş tu dê bibînî.

**Karik (Berfanbar 22- Rêbendan 20)**



Ji nişka ve tu dê biçî rêyekê. Di dawiyê de tu dê tiştekî baş peyda bikî. Rûyê te dê bikene.

**Dêwlik (Rêbendan 21 - Reşemî 18)**



Roja duşemê dê aloziyek biçûk ji bo te çêbibe. Hevaleke te ya nêzîk dê harîkariya te bike û ew alozî êdî namîne.

**Masî ( Reşemî 19 - Adar 20)**



Meha ku tê tu dê biçî şahiyekê an jî daweteke. Tu dê li wê derê hinek mirovên baş binasî. Dibe ku tu mala xwe bar bikî û biçî bajarekî din.

### *4- Bersiva pirsên jêrîn bide.*

1. Tu dê sibehê di saet yekê de çi bikî?

.........................................................................

2.Tu dê heftiya ku tê roja şemiyê çi bikî?

.........................................................................

3. Tu dê kengî biçî betlanê?

.........................................................................

4- Sala tê tu dê li ku derê bî?

.........................................................................

5- Gava ku te dibistan qedand tu dê bibî çi?

.........................................................................

6- Îro saet çendê tu dê biçî mala xwe?

.........................................................................

7- Tu dê havînê çi bikî?

.........................................................................

8- Tu dê roja Newrozê çi bikî?

.........................................................................

9- Tu dê şewê li mala xwe bi an jî na?

.........................................................................

10- Tu dê bikarî hindek diravan bi deyn bidî min?

.........................................................................

11- Tu dê roja rojbûna xwe çi bikî?

.........................................................................

Institut kurde de Paris

## 11 C

***1- Li wênayan binêre. Ew mirov dê çi bikin? Li bin wêneyan binivîse.***



Ew.....dê....binive......



..................................



..................................



..................................



..................................



..................................

Institut kurde de Paris

## *2- Hevokan jêrîn wergerîne dema pêşî û dema borî*

***Mînak:*** Ez pirtûkê dixwînim (dema niha)
Ez dê pirtûkê bixwînim (dema pêşî)
Min pirtûk xwend (dema borî)

1- Ez temaşeyî televizyonê dikim

............................................................................................

............................................................................................

2- Tu xwarinê dixwî

............................................................................................

............................................................................................

3- Ew dersa xwe dike (mê)

............................................................................................

............................................................................................

4- Ew nameyê dinivîse (nêr)

............................................................................................

............................................................................................

5- Em diçin mala xwe

............................................................................................

............................................................................................

6- Hûn dibezin

............................................................................................

............................................................................................

7- Ew avjenî dikin

............................................................................................

............................................................................................

8- Zozan nan dipêje

............................................................................................

............................................................................................

9- Baran dibare

............................................................................................

............................................................................................

10- Binevş û Serdar diaxivin

............................................................................................

............................................................................................

Institut kurde de Paris

### ***3- Hevokên jêrîn bikin neyînî***

***Mînak:*** Ez dê heftiya ku tê bixebitim
Ez heftiya tê naxebitim

1- Em dê sibehê pîvazan biçinin

..........................................................................

2- Ez dê serê xwe bişom

..........................................................................

3- Hûn dê erebeyê biajon

..........................................................................

4- Ew dê sibehê bixebitin

..........................................................................

5- Tu dê sala ku tê biçî dibistanê

..........................................................................

6- Ew dê sala ku tê dest bi zanîngehê bike.

..........................................................................

### ***4- Didu didu bixebitin. Te û hevalê te pêncsed milyon dirav hene. Divê hûn wan diravan ji bo hinek karên baş serf bikin. Biryar bidin û binivîsin hûn dê bi wan diravan çi bikin?***

***Mînak:*** Em dê bihayê sed milyonan pirtûk bikirin.

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

### ***5- Van pirsên jêrîn ji hevalê xwe bike.***

1- Tu dê sibehê çi bikî?
2- Tu dê sala ku tê çi bikî?
3- Tu dê Newrozê çi bikî?
4- Dawiya heftiyê tu dê çi bikî?

Institut kurde de Paris

## 11 D

G. 31 **1- Divê Mirad çi bikî? Diyaloga jêrîn guhdarî bike û bixwîne**



| | |
|---|---|
| *Egîd:* | Êvar baş Mirad. Tu çawa yî? |
| *Mirad:* | Êvar baş Egît. Ez baş im belê min persîv girtiye. Tu çawa yî? |
| *Egîd:* | Spas, ez zor baş im. Hewa gelek sar e. Divê tu cilên germ li xwe bikî û li xwarina xwe miqate bibî. Divê tu yek-du rojan neçî kar û li mal bêhna xwe bidî. |
| *Mirad:* | Zor spas ji bo şîretên te, belê divê ez bixebitim, pir karê min heye. |

**Bersiva pirsan bide.**

1- Kî nexweş e?

..............................................................................

2- Egîd ji Mirad re çi got?

..............................................................................

3- Çima divê Mirad bixebite?

..............................................................................

4- Nexweşiya Mirêd çi ye?

..............................................................................

**2- Divê sibehê tu çi bikî? Binivîse.**

*Mînak:* Divê ez biçim dibistanê

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

### *2- Divê ew çi bikin? Pendên xwe li bin wêneyan binivîsin.*

***Mînak:*** Miradî persîv girtiye.

Divê ew cilên germ li xwe bike.

Divê ew hay ji xwarina xwe hebe.

Divê ew yek du rojan neçe kar û li mal bêhna xwe bide.



Şilan di sinifê de maye



Rizgîn lingê xwe şkandiye



Rohati tiliya xwe biriye



Bahozî çi dirav nîne

### 3- Binivîse tu divêt îro çi bikî.

..................................................................................................................................................
..................................................................................................................................................
..................................................................................................................................................
..................................................................................................................................................
..................................................................................................................................................
..................................................................................................................................................
..................................................................................................................................................
..................................................................................................................................................
..................................................................................................................................................
..................................................................................................................................................
..................................................................................................................................................

### 4- Bêjeyên girîng ji bo bîranînê.

| | | | |
|---|---|---|---|
| Şano | Derdor | Beşdarî | Biryar dan |
| Paşî | Binecih | Agahdarî | Bingeh |
| Serçawan | Guhertin | Bername | Serfiraz |
| Tenduristî | Serkeftin | Dereng | Bihîstin |
| Zivirîn | Nasîn | Gazind | Pewîstin |
| Wergirtin | Alozi | Draf | Hişyarî |
| Serf kirin | Hatin | Amedakar | Nûçe |
| Civîn | Ji nişka ve | Sibe | Alîkarî |
| Kenîn | Persîv | Bêhn dan | Heftiya tê |
| Meha tê | Sala tê | | |

### Bi van bêjeyan pênc hevokan çêbikin.

1- ..........................................................................................................
2- ..........................................................................................................
3- ..........................................................................................................
4- ..........................................................................................................
5- ..........................................................................................................

Institut Kurde de Paris

## *LÊ BINÊRIN Û BERSÎVA PIRSAN BIDIN*

### *"DÊ" DEMA BÊ*

**Erênî**

| | | | |
|---|---|---|---|
| Ez | | biçim | |
| Tu | | biçî | |
| Ew<br>Ew | dê<br>beyanî | biçe | dibistanê |
| Em<br>Hun<br>Ew | | biçim | |

**Neyînî**

| | | | |
|---|---|---|---|
| Ez | | biçim | |
| Tu | | biçî | |
| Ew<br>Ew | dê<br>beyanî | biçe | dibistanê |
| Em<br>Hun<br>Ew | | biçim | |

***Dema niha, dema borî û dema pêşî bi kar bînin û bi bêjeyên di nav kevanan de hevokan kuta bikin.***

1- Ez heftêya bê ............. (çûn) Mehabatê.

2- Tu ......... sibê çi ......... ?(xwarin)

3- Ew niha nameyekê ..............(nivîsin)

4- Hûn ....... yekşemê kar ......... (kirin)

5- Min dihu hevalek xwe .............(dîtin)

6- Te erebeya xwe firot ................. an na(firotin)?

7- Em ........... kengî ............. ?(nivistin)

8- Ez pêr bi mamosta re ............ (axaftin)

9- Şemamê dihu nexweş ..............(bûn)

10- Zelal û Pervîn niha rojname ..............(xwendin)

Institut Kurde de Paris

## DIVÊ

**Erênî**

| | | |
|---|---|---|
| Ez | divê | bixebitim |
| Tu | | bixebitî |
| Ew Ew | | bixebite |
| Em Hun Ew | divê (in) | bixebitin |

**Neyînî**

| | | |
|---|---|---|
| Ez | divê | nexebitim |
| Tu | | nexebitî |
| Ew Ew | | nexebite |
| Em Hun Ew | divê (in) | nexebitin |

***2-Binivîse û bêje mirovên jêrî ku divê çi bikin.***

***Mînak:*** Divê Zerdeşt biçe bijîşk. (çûn/bijîşk)
Divê Zerdeşt biçe bijîşk.

1- Belqîz tî ye. (vexwarin/av)

.........................................

2- Dilêr û Dîlber birçî ne. (xwarin/xwarin)

...........................................

3- Pereyê Miraz tune ye. (kar/kirin)

............................................

5- Nanê me tuneye.(kirîn)

.....................................

6- Zarok vesta ne. (nivistin)

..........................................

7- Eywana me gelek qirêj e.(şûştin)

.....................................

# UNÎTE 12

## 12 A XWENDIN

### 1- Berî xwendina nivîsarê pirsên jêrîn bibersivînin li gel hevalê/a xwe nîqaş bikin.

1- Ji te were çend Kurd li Tirkiyê dijîn
2- Piraniya wan li kîjan bajarî ye?
3- Ew çima penaber bûne?
4- Çi alozî û astengiyên wan hene?
5- Ew alozî û astengî dê çawa bêne çareserkirin?

### 32 2- Guhdarî teksta jêrîn bikin, paşî bixwînin û bersiva pirsan bidin.

ÇÎROKA GULŞÎLANÊ

*Îro nêzikî heft-heşt milyon penaberên Kurd li Tirkiyê dijîn. Tenê li Stenbolê sê an jî çar milyon penaberên Kurd hene. Gelek ji wan di kolikan de dijîn, jin û mêr û zarok di yek menzelê de dinivin û jiyana xwe wisa derbas dikin. Keça Kurd Gulşîlan yek ji wan penaberan e. Gulşîlan derbarê penaberiya xwe û jiyana xwe de diaxive.*

*"Bavê min ew çend sal bû çûbû Stenbolê. Demeke dirêj e ku min ew nedîditiye. Ez, dayîk û du birayên min tenê dijîn. Dayîka min carcaran digot bavê min em ji bîr kirine. Belê rojekê nameyek hat. Ew name ji bavê min hat. Di nameyê de wî digot "Werin Stenbolê." Em hemû gelek dilşad bûn. Ji ber ku êdî jiyana gundê me pir xweş nebû. Me nikaribû biçin zozanên xwe an jî nav zeviyên xwe. Gelek tengasiyên me hebûn. Me dixwest biçîn ciheki azadtir û serbestir. Me pir tiştên xweş derbarê Stenbolê de bihîstibûn û me weha dizanî ku Stenbol ji bo jiyanê ji gundê me baştir e.*

*Em li otobusekê siwar bûn û bi rê ketin. Di rê de min hizra mala xwe ya bajêr, avahiyên bilind, tiştên nûjen û jiyaneke rengîn kir.*

*Wê gava ku em gihîştin wê derê ez têgihîştim ku ew tiştên min di rê de hizir kirine ne rast in. Min nedikarî tirkî biaxivim. Ez her wekî biyaniyekî bêziman bûm li wê derê.*

*Bi dîtina bavê xwe ez geleki kêfxweş bûm. Ew geleki nehatibû guhertin. belê bêhna cigaran ji berê pirtir jê dihat.*

*Roja yekemîn ku em gihîştin Stenbolê ez nexweş ketim. Dayîk û bavê min nehêlan ez ji mal der bikevim. Wê rojê ez di mal de mam.*

*Di despêkê de dayîka min her roj digiriya. Jiyana wê derê ne wekî jiyana gundan bû. Li gundê me zevî, rez, bostan û cîranên pir baş hebûn. Li wê derê me tu tişt nîne û em cîranên xwe jî nanasîn. Me bêriya welatê xwe, xizmên xwe û heval û hogirên xwe pir kiriye. Jiyana bajarê biyanî her wekî jiyana girtîgehê ye. Ez hez ji wê derê nakim. Ez dixwazim bizivirim welatê xwe. Ew gotina Kurdan gelekî rast e; Bilbil kirine rikeya zêrîn belê wî her gotiye "ax ax welat".*

Institut kurde de Paris

***Bersîva pirsan bidin.***

1- Çend penaberên Kurd li Tirkiyê dijîn?

..........................................................................

2- Piraniya wan penaberan di avahiyên çawa de dijîn?

..........................................................................

3- Di nameya xwe de bavê Gulşîlanê çi digot?

..........................................................................

4- Çima Gulşîlan û malbata wê penaber bûn?

..........................................................................

5- Di rê de wê çi hizir kir?

..........................................................................

6- Ji te were çima bêhna cigaran pirtir ji bavê Gulşîlanê dihat?

..........................................................................

7- Çima dayîka wê digiriya?

..........................................................................

8- Gulşîlan dixwaze çi bike? Çima?

..........................................................................

9- Gulşîlan û malbata wê bi çi çûne Stenbolê?

..........................................................................

Institut kurde de Paris

## *3- Wate û bêjeyên jêrîn li hev bînin. Ya yekemîn mînak e.*

| | C | |
|---|---|---|
| 1- alozî, pirsgirêk | -------------- | a- penaber |
| 2- dilxweş | -------------- | b- dilşad |
| 3- kesê ne nasyar | -------------- | c- tengasî |
| 4- li serî | -------------- | d- biyanî |
| 5- mam, xal, xalet | -------------- | e- destpêk |
| 6- cihê girtî | -------------- | f- cîran |
| 7- kesê koçberbûyî | -------------- | g- xizm |
| 8- mirovên ku li derdora hev dijîn | -------------- | h- girtîgeh |
| 9- cihê ku dirinde lê dijîn | -------------- | i- kolît |
| 10- xanûber | -------------- | î- avahî |

### *4- Didu didu bixebitin û pirsên jêrîn ji hev bikin, bersîv bidin û paşî li gel sinifê nîqaş bikin.*

1- Ji te were Kurd çima ji welatê xwe derdikevin û penaber dibin?

.............................................................................................

2- Îro penaberên kurd li kîjan welatên biyanî belav bûne?

.............................................................................................

3- Rewşa penaberên Kurd çawa ye?

.............................................................................................

### *5- Berevajiyên rengdêrên jerîn ji nav hevokan peyda bikin.*

**1-** **nêzîk** **dilşad** **azad** **baş** **rast** **biyanî**

*Mînak:* nêzîk
dûr

a- Mala me gelek ji bajêr dûr e.

b- Serdar tu caran tiştên xerab nake.

c- Bahoz nasyar e. Ev ji gundê me ye.

d- Rozerîn ev du sal e girtiye.

e- Çima Şîlan dilnexweş bû?

f- Ew mirovekî/e çep e.

Institut kurde de Paris

**2-** **zirav** **qelew** **germ** **dereng** **giran** **tarî**

a- Binevş gelek zirav e.

b- Ew spîndar stûr e.

c- Dinya beyanî ronahî dibe

d- Zivistan sar e

e- Ew dê zû bigehin armanca xwe

f- Pelg sivik e.

3- **mezin** **dirêj** **kevin** **pîr** **erzan** **kirêt**

a- Nêrgiz pir ciwan e.

b- Beybûn gelek ciwan e.

c- Ew pirtûk giranbiha ye.

d- Şîrvan kurt e.

e- Navê xuşka min a biçûk Belqis e

f- Kirasê te nû ye.

4- **nerm** **hişk** **tijî** **nizm** **teral** **zana**

a- Ew şelwar hêj ter e.

b- Çiyayê Agirî pir bilind e.

c- Zerîn xwendekareke zîrek e.

d- Divê mirovên nezan bizanin ku ew nezan in.

e- Kevir req e.

f- Ew îskan xalî ye.

5- **Dewlemend** **pan** **şîrîn** **xar** **dengdêr** **nebir**

a- Ew kêr tûj e.

b- Ew rê teng e.

c- Jehr tal e.

d- Hûn çima dengdar in û naaxifin?

e- Ew spîndar rast e.

f- Mîrza tu dirav nîn in. Ew xizan e.

Institut kurde de Paris

**6- Rengdêrên jêrîn biguherin û bikin nav.**

***Mînak:*** Azad: <u>azadî</u>

| | | | |
|---|---|---|---|
| 1- Nêzîk | -------------------- | 11- Xalî | -------------------- |
| 2- Dilşad | -------------------- | 12- Ronahî | -------------------- |
| 3- Rast | -------------------- | 13- Dûr | -------------------- |
| 4- Qelew | -------------------- | 14- Baş | -------------------- |
| 5- Germ | -------------------- | 15- Xerab | -------------------- |
| 6- Zirav | -------------------- | 16- Zû | -------------------- |
| 7- Pîr | -------------------- | 17- Ciwan | -------------------- |
| 8- Dirêj | -------------------- | 18- Dengdar | -------------------- |
| 9- Sivik | -------------------- | 19- Dewlemend | -------------------- |
| 10- Giran | -------------------- | 20- Nerm | -------------------- |

***7- Bi bêjeyên jorîn deh hevokan çê bike***

1- ......................................................................................................

2- ......................................................................................................

3- ......................................................................................................

4- ......................................................................................................

5- ......................................................................................................

6- ......................................................................................................

7- ......................................................................................................

8- ......................................................................................................

9- ......................................................................................................

10- ....................................................................................................

Institut kurde de Paris

## 12 B

G. 33

### *1- Rojnamegerekê hevpeyvînek li gel Gulşîlanê kiriye. Guhdarî bikin û cihên vala tijî bikin.*

*Rojnameger:* Rojbaş Gulşîlan. Ez dizanim ku tu li wir penaber î. Tu dikarî ji kerema xwe re bersivên pirsên min bidî.

*Gulşîlan:* Rojbaş. Belê serçavan. Kerem bike

*Rojnameger:* Tu çend salî yî?

*Gûlşîlan:* Ez ............ salî ....... .

*Rojnameger:* Te çend xwîşk û ...... ........

*Gulşîlan:* .......... ............ ......... .. ......... ............

*Rojnameger:* Tu ........ ............ ............?

*Gulşîlan:* Belê. Ez diçim sinifa çaremîn.

*Rojnameger:* Bavê te çi karî .........?

*Gulşîlan:* .......... .......... ............

*Rojnameger:* Diya te ...... çi karî ............?

*Gulşîlan:* .......... ........ jina ....... .....

*Rojnameger:* Jiyana te li wir çawa ye?

*Gûlşîlan:* Pir ........... ................

*Rojnameger:* ........................?

*Gulşîlan:* ..... ..... ..ez....hewal û hogirên xwe dikim. Ez bêriya......xwe dikim. Li wir herwekî jiyana........ ye.

*Rojnameger:* Niha tê......... çi bikî Gûlşîlan?

*Gulşîlan:* Ez dixwazim ........... .........xwe û ......... û azad bijîm.

*Rojnameger:* Hêvîdar im ku tu dê bigihî daxwaziya xwe. Zor spas ji bo wê hevaxiftinê.

*Gulşîlan:* Ez spas dikim. Serçavan.

*Rojnameger:* Serçavan.

Institut kurde de Paris

### *2- Didu didu bixebitin, yek ji we bila rojnameger be û yek jî bila Gulşîlan be. Diyaloga jorîn bixwînin û pratîkê bikin.*

### *3- Peragrafeke biçûk der barê jiyana Gûlşîlanê de binivîsin.*

Wisa dest pê bikin: Gulşîlan keçeke kurd e. Ew penaber e û ew li Stenbolê dijî......

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

..........................................................................................................................

## 12 C - XWENDIN

### *1- Beriya xwendina teksta der barê Newrozê de pirsên jêrîn bibersivînin û nîqaş bikin.*

1- Newroz kîjan rojê tê pîroz kirin?
2- Dehaq û Kawayê Hesinker kî ne?
3- Ji te were wateya Newrozê çi ye?
4- Gelê Kurd roja Newrozê çi dike?

### *2- Niha teksta derbarê Newrozê de bixwînin û bersivên pirsên der barê tekstê de bibersivînin.*

*ÎRO NEWROZ E*




*Îro Newroz e, an jî îro roja nû ye. Nûroj e. Bîst û yekê (21) Adarê ji bo Kurdan û gelek gelên herêmî serê salê ye.*

*21ê Adarê rojek gelek girîng e.*

*Adar heyva yekemîn a demsala biharê ye. Di wê heyvê de hêdî hêdî berf radibe û belekî dikeve çiyayên Kurdistanê. Êdî serma berf û rojên reş xelas dibin.*

*21ê Adarê mizgîniya jiyaneke nû ye. Nûroj e an jî Newroz e. Bi hatina Newrozê re dinya germ dibe, baran dibare û her tiştek avisê jiyaneke nû ye. Ji nav çiyayan, mêrg û zeviyan û devdolan gul û kulîlkên heftrengîn vedibin. Rûbar û kanî boş dibin, darên fêkî û darên rêlê belgên xwe didin û dinyayê hêşîn dikin. Di wê mehê de hemû dirinde jî derdikevin holê. Vîte vîta çûçikan û dengê şalûl û bilbilan herwekî senfoniyeke Beethoven an jî Mozart tê, guhên mirov. Dîsa bi destpêka Newrozê re rez û darên fêkî têne kezaxekirin, hevdên bostan û tutinan tên çandin. Bi her awayî Newroz destpêka jiyaneke nû ye.*

*Ji hêla dîrokê ve jî Newroz girîngîtiya xwe û wateya xwe diyar dike. Gelek çavkanî û berhem dibêjin bi navê Dehaq qiralek hebû û wî bi salan gelek zilm û zorî li gelê herêmê dikir. Dîsa ji wan çavkanî û berheman were Dehaq nexweşiyeke giran digire. Bijîjkên wî dibêjin dermanê wê nexweşiyê mêjiyê*

Institut kurde de Paris

*mirovan e. Divê her roj Dehaq mejiyên du ciwanan li birînên xwe bide da ku wê nexwişiyê çareser bike.*

*Dehaqî ferman da ku her roj Kurdistanî du mêjiyên ciwanan bînin qesra wî. Bi wî awayî Dehaqî bi salan ciwan kuştin û zilm û zora xwe li ser gelên Kurdistanê kudand.*

*Kurdistaniyan êdî nedixwastin ku zarokên wan bihên kuştin. Wan ciwan rêkirin çiyayan, parastin û veşartin. Roj bi roj hejmara ciwanan li çiyayan pirtir dibû ji ber ku çiya ji hemu cihan ewlekartir bû ji bo jiyanek azad.*

*Nêzîkî qesra Dehaqî li gundekî mirovek bi navê Kawayê Hesinker dijî. Wî ji bo leşkerê qiralî çek çêdikirin. Kawayê Hesinker jî heft zarokên xwe dabûn qiralî. Rojekê ger (dor) tê kurê wî yê biçûk. Belê Kawayê Hesinker wê carê dijî wê rewşê derdikeve. Ew hemû çekên depoya xwe dide gundiyan û li ciwanên çiya belav dike. Kawayê Hesinker serhildanekê mezin dide destpêkirin. Di bin serokatiya wî de gundî û ciwanên serê çiya êrîşê dibin ser qesra Dehaqê zalim. Ew leşkerî Dehaqî dikujin û qesra wî dişewîtinin. Gundî û şervanên azadiyê heta beyanê li ber revneqa agirê qesra Dehaqî govend digirin û azadî û serxwebûna xwe pîroz dikin.*

*Ji wê rojê heta niha 21'ê Adarê ji aliyê kurdan û gelên herêmêve weke roja rizgarbûnê û xelasbûnê tê pejirandin. Di wê rojê de kurd agir heldikin, govend digirin û cilên wekî kulîlkên heftrengîn werdigirin. Zarok, mezin, jin û mêr, pîr û kal hemû cejna yek û dû bi şahî pîroz dikin.*

*Di nav kurdan de der barê Newrozê de baweriyek heye? Dibêjin roja Newrozê divêt çi kes nenive. Yên ku roja Newrozê binive ew dê wê salê seranser, heta Newrozeke din, bi xew û xamûş bibe.*

*Ew nikare çi kar bike ji ber ku ew roja Newrozê nivistiye.*

*Wateya wê baweriyê çî ye? Wateya wê baweriyê ew e ku roja Newrozê roja azadîbûne û serhildanê ye. Divê herkes ji bo azadî û pêşeroja xwe hişyar bibe, nenive û serê xwe hilde dijî Deheqên zalim û xwînxar.*

Institut kurde de Paris

***Pirsên der barê tekstê de bibersivînin.***

1- Newroz kîjan rojê tê pîroz kirin?

.........................................................................................

2- Sersala Kurdan û gelên herêmê kengî ye?

.........................................................................................

3- Bi hatina Newrozê re çi dibe?

.........................................................................................

4- Dehaq mirovek çawa ye?

.........................................................................................

5- Dermanê derdê Dehaqî çî ye?

.........................................................................................

6- Wezîrê Dehaqi çi dike?

.........................................................................................

7- Ciwan diçin ku derê? Çima?

.........................................................................................

8- Kawayê Hesinker li dijî çi derdikeve?

.........................................................................................

9- Kawayê Hesinker serhildanê çawa dide destpêkirin?

.........................................................................................

10- Gundî û ciwanên serê çîya çi dikin?

.........................................................................................

11- Newroz ji aliyê Kurdan ve çawa tê pejirandin?

.........................................................................................

12- Gelê Kurd roja Newrozê çi dike?

.........................................................................................

13- Di nav Kurdan de der barê Newrozê de baweriyek çawa heye?

.........................................................................................

14- Wateya wê baweriyê çi ye?

.........................................................................................

Institut kurde de Paris

## *3- Hevokan bi bêjeyên jerîn kuta bikin.*

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| **dijî** | **Newroz** | **germ** | **kulîlk** | **dîl** |
| **agir** | **govend** | **girtin** | **pîroz û** | **piştî** |

1- ............. sersala Kurdan e.
2- Havînê dinya gelek germ e.
3- Divê herkes ............. zilm û zoriyê derbikeve.
4- Di welatê me de ............. pir hene
5- Dehaq ............. hat girtin.
6- Ciwanan roja Newrozê ............. helkir û .............
7- Newroza te ............. be
8- Min sertêşt xwar ............. ez çûm dibistanê.
9- ............. adarê avrêl e.

## *4- Ji nav teksta derbarê Newrozê de çar lêkeran, çar rengdêran, û çar navan peyda bikin û ser lîsteya jêrîn binivîsin.*

a- Lêker: barîn, vebûn ...................... ......................
...................... ......................
b- Rengdêr: germ, xwînxar ...................... ......................
...................... ......................
c- Nav: adar, agir ...................... ......................
...................... ......................

## *5- Bi wan bêjeyên ku we di nav tekstê de peyda kirin hevokan çêkin*

| | | | |
|---|---|---|---|
| ***Mînak:*** | Barîn: | Baran | barî |
| | Vebûn: | Kulîlk | vebûn |
| | Germ: | Ew gava dinya germ dibe, em diçin avjeniyê | |

..............................................................................................................
..............................................................................................................
..............................................................................................................
..............................................................................................................
..............................................................................................................
..............................................................................................................

Institut kurde de Paris

## 12 D - KARTA NEWROZÊ

***1- Kurd ji bo heval û xweştewîstên xwe roja Newrozê kartan rêdikin, karta Cembelî bixwînin.***




***2- Niha hûn bi bêjeyên jerîn karteke Newrozê binivîsin.***

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Hevalê/a | Newroza | di | dikim | ji |
| te | Ez | û | | bo |
| birûmet | sala | serfirazî | | te |
| pîroz | nû | xweşiye | | |
| da | û | dixwazim | | |

*Bahoz Baran*

***3- Niha tu ji bo hevalê/a xwe karteke Newrozê binivîse.***

*Hewalê/a xweştewîst,*

........................................................................

........................................................................

........................................................................

........................................................................

........................................................................

........................................................................

........................................................................

..............................

## *4- Bêjeyên giring ji bo bîranînê*

| | | | |
|---|---|---|---|
| penaber | dîtin | ciwan | agir helkirin |
| bihîstin | nasîn | qesr | pejirandin |
| biyanî | çandin | gehiştin | |
| girîng | mêjî | girtîgeh | |
| sersal | êrîş | avis | |
| dirind | rizgarbûn | wate | |
| berhem | cejn | çareserkirin | |
| rêkirin | serhildan | girtin | |
| helatin | dilşad | xelasbûn | |
| govend girtin | avahî | pîrozkirin | |
| bawerî | guhirtin | pêşeroj | |
| bîrkirin | bêrîkirin | vebûn | |
| Siwar bûn | jiyan | kulîlk | |

### *Deh hevokan ji wan bêjeyan çêbikin*

1- ................................................................................................

2- ................................................................................................

3- ................................................................................................

4- ................................................................................................

5- ................................................................................................

Institut Kurde de Paris

# AZMÛNA ZIMANÊ KURDÎ 1

## *I -Beşa rast hilbijêre.*

1- Binevş û Sosin xwendekarên zîrek ....
   a) e
   b) in
   c) im
   d) ye

2- Mîterand ..... Frensayê ye.
   a) jê
   b) ya
   c) ji
   d) jî

3-
A: Navê ....... çi ye?
B: Sîbel e.
   a) wê
   b) wî
   c) wan
   d) ez

4- Navên ......... Beybûn û Gulexwîn in.
   a) min
   b) em
   c) hûn
   d) wan

5- Tu çend salî yî?
   a) ez baş im
   b) zor spas
   c) çil û neh
   d) heta

6- Karê bavê wî çi ye?
   a) baş e
   b) nexweş e
   c) parêzer e
   d) karê min baş e

Institut kurde de Paris

7- Ew ...... kurdî çi ye?
a) bi
b) ji
c) li
d) jê

8- Beybûn li ...... Amedê dijî.
a) ser
b) bin
c) jê
d) nav

9- Min gelek heval ......
a) heye
b) hindik
c) hene
d) heyin

10- Jina bavê birayê min .......... min e.
a) xwişka
b) xaltîka
c) dayika
d) meta

11- Zordest ..... ....... aştiyê nakin.
a) hez/ji
b) hez/ye
c) je/ji
d) jî/hez

12- Zelal ...... saet dehan ........
a) bila/dixebite
b) heta/dixebite
c) bixebite/heta
d) dixebite/bila

13- Zerê niha li mal kovarê .......
a) dikire
b) bixwîne
c) dixwîne
d) bifiroşe

Institut kurde de Paris

14- Saet çend e?

a) Heft û nîv e.
b) Şeş e
c) Pêncan bîst dibure
d) Pêncan bîst kêm e




15- Em beyanî zû ........ zanîngehê.

a) diçe
b) diçim
c) diçin
d) dixwînin

16- A: Tu cigarê dikşînî?
B: Na, ez ............ nakşînim. Min cigare berdaye.

a) hemû caran
b) tu caran
c) bikêşim
d) kêm

17- A: ..... tu dinivî?
B : Saet di yanzdehan de.

a) kengî
b) çi re
c) çend
d) çima

18- Rojnameyek ..... çendê ..... ?

a) ji/ye
b) ji/ya
c) bi/y
d) bi/ye

19- Bişar û Hişyar ....... xweş .......

a) dikarin/bibezim
b) dikarin/dibezin
c) dikarin/bibezin
d) dikare/bibeze

20- Êdî ez dixwazim ..... ji ber ku ez gelekî westiyame.

a) bixebitim
b) binivim
c) dinivim
d) govend bigirim

Institut kurde de Paris

***II - Listeya jêrîn kuta bike. Heke bêje kêm be li ser lîsteyê çi puan nayên dayin. Ji bo wê pirsê***

1-Roj baş, ..................., ...................
2- Min, te, ..... , ..... , ..... , ..... , ......
3- Bijîşk, dadmend, ..... , ..... , ..... , ..... , .....
4- Hirmî, Zerdalî, ..... , ..... , ..... , .....
5- Bira, xwişk, ..... , ..... , ..... , .....
6- Jiyan, xwendin, ..... , ..... , ..... , .....
7- Kurtek, pêlav, ..... , ..... , ..... , .....
8- Tu caran, hemû caran, ..... , ....., .....
9- Şemî, yekşem, duşem, ..... , ..... , ..... , .....
10- Du, çar, ..... , ..... , ..... , .....

***III - Teksta jêrîn bixwînin û pirsan bibersivînin.***

## *GOLA WANÊ*



Gola Wanê mezintirîn gola Kurdistanê ye.

Aqara wê 3.764 km² ye. 8 km. li Rojavayê Wanê dikeve.

Bilindahiya wê ji serpilka deryayê 1646 m. ye. Kûrtirîn ciyê wê jî 100 m. ye. Dirûvê wê kêm û zêde mîna sêgoşeyekê ye. Dirêjahiya golê di navbera Tetwan û Çemê Behdînanî de ketiye û bi qasî 125 km ye. Berahiya wê li gorî ciyan ferq dike. Li hinek ciyan kêmber e û li hinekan jî biber e. Gola Wanê wekî newaleke devgirtî ye ku bi qasî 12000 km² av di xwe de civandiye. Gol ava xwe ji çend çeman distîne. Ji aliyê bakur ve ji Çemê Zîlan, ji aliyê bakurê rojhilat ve ji Çemê Behdînanî, ji aliyê rojhilatê ve ji Çemê Reş, Çemê Xoşabê; ji aliyê başûr ve ji Çemê Argafê tên û dirijin golê.

Ava golê 22 li ser hezarî şor e (%022). Ji ber ku gol ji çar aliyan ve girtî ye.

Ava golê, bi taybetî beşa wê ya bakur, germ dibe û germahiya wê ji 20 C'yan derbas dibe. Ji ber sermayê, di zivistanê de ava hinek şûnên golê yên himbiz diqerisin. Ji ber şorbûna ava wê, di Gola Wanê de masî ne pir in. Tenê hinek masiyên ku dikarin di nava ava şor de bijîn tê de hene. Di navbera navenda bajarê Wanê û bajarokên dorhêla wê de, keştiyên biçûk hene. Li Tetwan, Xelat, Elcewaz, Ercîş, Wan, Edremît, Gevaş û Reşadiyeyê lengergehên (îskele) keştiyan hene. Dor û berên Gola Wanê ji ber hebûna hêşînahî û zinaran pir bedew e.

Di nava golê de, giraveke dîrokî ya pir navdar heye. Ev girav Helemar e û li ser vê giravê dêreke ku ji bo fileyan pir girîng e heye.

### *Pirsên Jerîn bibersivînin*

1- Mezintirîn Gola kurdistanê kîjan e?

..............................................................................................

2- Bilindahiya Gola Wanê ji serpilka deryayê çî ye?

..............................................................................................

3- Dirêjahiya wê çî ye?

..............................................................................................

4- Gola Wanê ava xwe ji kîjan çeman distîne?

..............................................................................................

5- Çima di Gola Wanê de masî pir nîn in?

..............................................................................................

6- Li derdora Gola Wanê kîjan bajarok hene?

..............................................................................................

7- Di nava Gola Wanê da kîjan girav heye?

..............................................................................................

8- Di nava giravê da çi heye û ji bo kê girîng e?

..............................................................................................

## *IV - Name*

*Hevalê xweştewîst Tahsîn,*

*Tu çawanî baş î? Ez hêvîdarim ku jiyane te xweş be. Ew sê sal e min tu nedîtî û pir xema te dikim.*

*Ez dizanim jiyana welatê biyan ne wekî jiyana Kurdistanê ye. Hewaya Norweçê jî pir sar e û roj jî kêm dihelê. Hêvidarim tu xweş rojên xwe derbas dikî. Tu zimanê Norweçî fêr bûyî an jî ne? Te ji xwe re karek peyda kiriye an jî na? Te ji xwe re jin anîye an jî na? Hê gelek gelek pirs hene ku ez dixwazim ji te bikim belê ez dê wan jî di nameyek dinde ji te bipirsim.*

*Ji kerema xwe re silavên min bigehîne hevalê Xalo, Riza, Hoşeng, Salman jina wî û keça wî Hevjînê.*

*Gelek silavan li jina te Rojê jî dikim. Bimîne di xweşiye de.*

***Serdar Baran***

### *Pirsên Jêrîn bibersivînin*

1- Name ji kî ye?

..............................................................................

2- Name ji bo kî ye?

..............................................................................

3- Çend sale wî hewalê xwe ne dîtîye?

..............................................................................

4- Tahsîn li ku derê dijî?

..............................................................................

5- Xalo, Riza, Hoşeng û Salman kî ne?

..............................................................................

6- Navê jina Tahsîn çî ye?

..............................................................................

Institut Kurde de Paris

## PIRSIYARÎ YA ZIMANÊ KURDÎ 2

### *I- Alternatîfa çêtîrîn hilbijêre.*

1- Ez --------------- heyva tê --------------- welatê xwe

a) da / dizivirim
b) dê / bizirim
c) dê / bizivirin
d) dê / zivirîbûm

2 - Zelal û Lezgîn dihu li dibistanê----------------

a) ne
b) bû
c) bûn
d) bûm

3) Hûn pêr çima li mal --------------

a) nebûn
b) nebûm
c) nebî
6) nînî

4- Min îro hemû rojname --------------

a) dixwend
b) dixwendin
c) xwendin
d) bixwînim

5- Îro dinya gelek germ -------------- , belê dihu sar --------------

a) bû / e
b) e / bû
c) bûn / e
d) e / bûn

Institut kurde de Paris

6 - Gulîzarê nameyek -------------- û em paşî nivistin.

a) dinivisî
b) binivise
c) nivîsand
d) dinivîsin.

7- Min îro marek li nav rezê xwe --------------

a) dîtin
b) dibinîm
c) bibînim
d) dît

8- -------------- dû sêv xwarin --------------

a) wê / xwarin
b) Tu / xwarin
c) Te / bixwe
d) Wî / dixwe

9- Rengîn 51 kîlo ye. Zelal jî 51 kîlo ye.

a) Rengîn ji Zelalê qelewtir e
b) Zelal hindî Rengînê qelew e
c) Rengîn qelewtirîn e
d) Zelal ji rengînê lewaztir e

10- Erebe ji televîzyonê -------------- e

a) erzantir
b) bahatir
c) bahatirîn
d) erzantirîn

11- Ew erebeya --------------

a) te
b) we
c) me
d) min

Institut kurde de Paris

12- Ew -------------- me ne

a) hesp
b) hespên
c) hespa
d) hespan

13- -------------- Sîso û Çelo li taxê jorîn ne

a) Xaniya
b) Xaniyên
c) Xanî
d) Xaniyên

14- Hûn -------------- avjenî -------------- ?

a) dikarim / bikin
b) dikarin / bike
c) dikare /bikim
d) dikarin /bikin

15- Di mala te de çend kursîk -------------- ?

a) heye
b) hene
c) hebûm
d) hebîn

16- Em dê piştî nîvro ji -------------- re telefon ---------

a) tu / bikin
b) Te / bikin
c) wan / bikim
d) wî / bike

17- Em -------------- dersa xwe baş --------------

a) da / bizanin
b) dê / bizane
c) divê / bizanin
d) divê / bizanim

Institut kurde de Paris

18- -------------- çem li dinyayê -------------- e?

a) çima / dirêjtirîn
b) kengî / dirêjtir
c) kîjan / dirêjtirîn
d) kî /dirêjtir

19- Tu -------------- şiklan (wêneyan) -------------- ?

a) dikare / çêkî
b) dikarî / çêkî
c) dikarin / çêkin
d) dikarim / çêkim

20- hûn -------------- azad û serbixwe -------------- ?

a) dixwazim / bibim
b) dixwazin / bibin
c7 dixwaze / bibe
d) dixwazî / bibî

***II - Listeya jêrîn kuta bike. Heke yek bêje kêm be li ser listeyê çi puan nahen dan.***

1- Bihar -------------- -------------- --------------
2- Berfanbar -------------- -------------- --------------
3- Kesk -------------- -------------- --------------
4- Kîjan -------------- -------------- --------------
5- Nebitîn -------------- -------------- --------------
6- Belengazî -------------- -------------- --------------
7- Dewlemend -------------- -------------- --------------
8- Dirêjtir -------------- -------------- --------------
9- Zîrektirîn -------------- -------------- --------------
10- Gingiluk -------------- -------------- --------------
11- Difin, çav -------------- -------------- --------------

Institut Kurde de Paris

## *III - XWENDIN*

Di destpêka sala 1940'an de ji ber bilindbûna şerê gelê kurd li Kurdistana Başûr û Rojhilat hejmara welatparêzên Kurd her diçû pirtir dibû. Ji wana yek jî Yunus DILDAR bû. Ew di sala 1918'an de li bajarê Koysancaxê bû. Wî xwendegeha pêşîn li bajarê Ranya, ya navîn jî li bajarê Hewlêr kuta kir. Piştî xilaskirina wan dibistanan ew çû zanîngeha dadgeriyê.

Di nav wan salan de navê Dildar li Kurdistanê hêdî hêdî dihate bihistin. Di vê demê de wî şev û roj efrandinên nivîskarê Frensî, Tirkî û Yewnanî dixwend û xwe pêş ve dibir. Êdî li pêşiya wî dengên nû hatibûnê vekirinê. Dema ku di sala 1948'an ta li Kurdisana, Rojhilate Komara Mehabadê hate damezirandin helbesta wî "Ey, Reqîp" bû merşa wê komarê. Gelek salan wê merşê tirs û xofeke mezin xiste dilê hêzên kolonyalîst. Ew merş niha jî ji aliyê hemû Kurdan ve merşa neteweyî tê pejirandin.

Di wan deman de gelek helbsetên wî jî li ser rûpelên kovara "Gelawêj" dihatin weşandinê. Merşa wî ya bi navê "Kurdistan" wek straneke di nav gel de belav bû.

Ji aliyê din ve, Dildarî gelek berhemên Lafonten û Lamartîn wergerandiye zimanê Kurdî. Belê mixabin mirina Dildar (1948) xebatên wî bi tevayî nîvî hêlan.

*(ji rojnameya Rojê yą bi demjimêr 6 Rêbendan 1997 duşem)*

**BERSIVA PIRSIYARAN BIDIN**

1- Yunus DILDAR li ku derê û kengî ji dayîk bû?

.................................................................................................

2- Wî dibistana pêşîn û ya navîn li ku derê kuta kir?

.................................................................................................

3- Komara Mahabadê kengî hate damezirandin?

.................................................................................................

4- Nivîskarê helbesta "Ey Reqîp" kî ye?

.................................................................................................

5- Helbesta " Ey Reqîp" cara yekemîn bu merşa kîjan komarê?

.................................................................................................

## *IV - Hevokên jêrîn bi bêjeyên di nav kevanan da kuta bikin. Divê hûn forma wan bêjeyan biguherin.*

*Wekok:* Em dê havînê biçin zozanan (HAVÎN)

1- Çîyayê Agirî ji çiyayê Cîlo ......................... e (BILIND)
2- -------------- çiyayê Agirî 5165 mitro ye (BILIND)
3- Milyonan ------------ Kurd li dinyayê belav bûne. (PENABER)
4- Tu çend zimanan -------------- (ZANÎN)
5- -------------- Kurdî gelek dewlemend e. (ZIMAN)
6- Bi -------------- hevalên xwe ez gelek xweşhal bûm (DÎTIN)
7- -------------- hemû caran xerabiyê çêtir e. (Baş)
8- Navê -------------- jêhatî Belqis e (DAYÎK)
9- -------------- Şîlanê karker e (BAV)
10- Em -------------- serfiraz bibin (XWESTIN)

11- Çelo ḍikare sê zimanan -------------- (AXAFTIN)
12- Rizgîn rojê donzdeh saet -------------- (XEBITÎN)
13- Ew -------------- ser maseyê yên me ne (PIRTÛK)
14- Heftiya çûyî Feşo li Hewlêrê -------------- ( BÛN)
15- Rewşenê sê keç û çar kûr -------------- (HEBÛN)

## *V - NIVÎSANDIN*

Der barê havîna xwe ya çuyî de kompozîsyoneke 150 bêjeyî binivîse.

Hindek pirs ji bo alîkariya we

1- Tu li ku derê bûyî? Tu çuyî ku derê?

..............................................................................................

2- Tu çend rojan li wê derê mayî?

..............................................................................................

3- Li wê derê çi hebû çi nebû?

..............................................................................................

4- Te kî dît?

..............................................................................................

5- Te li wê derê çi kir

..............................................................................................

6- Tu kengî zivirî?

..............................................................................................

7- Tu bi çi çuyî û bi çi zivirî?

..............................................................................................

8- Ramanên te der barî wî cihê de çi ne?

..............................................................................................

Institut Kurde de Paris

Institut Kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

ISBN 975-96610-9-8